# YPS: Li Amedê di çalakiyan de 10 polîs hatin kuştin...

R3

## YPG: Em ê li gorî biryarên Astanayê tev negerin

YPG'ê der barê danûstandinên li paytexta Kazakistan Astanayê de daxuyaniyeke nivîskî weşand û wiha got: "Em ji bo Astanayê nehatin vexwendin. Ji ber vê em li gorî biryarên ku di vê civînê de têne dayîn, tev nagerin." ...

R8



## Astana bû têkçûna Tirkiyeyê

Civîna Astanayê ya ku bi troykaya Rûsya, Îran û Tirkiyeyê hat birêvebirin bi danezanekê bi dawî bû. Di danezanê de têkçûna polîtîkaya Tirkiyeyê ya Sûriyeyê derket pêş...

R4

ROJEVA Medya

25 Çile Çarşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 76

## 'Me soz daye Ebû Leyla'

Fermandarê Şems Şîmal Mihemed Ebû Adil ku di nav berxwedana destanî ya Kobanê de cih girt, di salvegera duyemîn a serkeftina Kobanê de diyar kir ku ruhê yekitiyê yê fedayî ku li Kobanê derket holê, Minbic rizgar kiriye. Ebû Adil bi bîr xist ku Kobanê neketiye û dê di demeke nêz de Reqqa bikeve. Ebû Adil got ku wan soz daye fermandarê xwe yê şehîd Feysal Ebû Leyla û dê xeyala wî pêk bînin... RÛPEL - 5



## 'Gotina me ya dawîn NA ye'

Hevberdevkên HDK'ê têkildarî referandûma were kirin destnîşan kir ku pêdiviya Tirkiyeyê bi serokdewletiyê tune ye û wiha axivîn: "Gotina me ya dawîn 'Na' ye." û starta xebatên refrandûmê da. Li aliyê din nûnerên saziyên jinan ên Îzmîrê jî da zanîn ku ew ê jî di referandûmê de bibêjin 'na'... RÛPEL - 2/7



# Doz ket hevkarî derket

Piştî kuştina kujer Omer Guney daraza Fransayê doza Komkujiya Parîsê xist. Bi xistina dozê re şirîkatiya Fransayê ya di sûîqestê de careke din derket holê

### LÊGERÎNA EDALETÊ DIDOME

Di 9'ê Çileya 2013'an de yek ji damezirînerên PKK'ê Sakîne Cansiz, nûnera KNK'ê ya Parîsê Fîdan Dogan û endamaTevgera Ciwanan Leyla Şaylemez bi tevneke qirêjî bi destê tetikkêş Omer Guney hatin qetilkirin. Ji wê demê ve gelê kurd lêgerîna xwe ya edaletê didomîne.

### ŞIRÎKATIYA FRANSAYÊ PESEND BÛ

Di erîfeya dîtina dozê de mirina biguman a kujer Guney û ji aliyê dadgehê ve xistina dozê, gumanên gelê kurd û hêzên demokrasiyê yên der barê şirîkatiya Fransayê de jî pesend kirin. Hem Tevgera Azadiyê û hem jî jinên kurd diyar kiribû ku dê destûrê nedin ku doz bê girtin... R- 3



## Armanc azadiya Ocalan e

Meclisa Îştarê ya Wargeha Şehîd Rustem Cûdî ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daxuyaniya çapemeniyê da û di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Yekane armanca me, mîsogerkirina azadiya Rêber Apo ye." ... RÛPEL -2

## Ev doz li vir naqede!

Di çalakiyên jinan ên li seranserî Ewropayê de ji bo Sarayan jinan peyama 'doz li vir neqediya' da... R - 3



## Dawî li îşkenceyan nayê

Îşkenceyên li girtîgehan ji dema 12'ê Îlonê jî xerabtir bûne. Girtiyên li Girtîgeha T4 a li Şakrana Îzmîrê diyar kir ku wan li dijî ferzkirina kartan, zext û binpêkirinên mafan, biryar daye ku dernekevin hevdîtinên vekirî. Li Edîrne û Çankiriyê jî girtî di greva birçîbûnê de ne... RÛPEL - 7



## Îradeya şarî qezenç kerd

Fermandarê YPSyî Şîyar Botanî Serrgêra 1. ya awanbîyayîşê YPSyî pîroz kerd û derheqê xoverdayîşê Xoserîya Demokratîke de wina va: "Nê xoverdayîşî de qehremanîyê girdî ameyî nîşandayîş. Ma do nê xoverdayîş û qehremanîyan xo vîra nêkerî. Ma do têkoşînê înan gird bikerî." ... RÎPEL - 10

> 'Biratiya olî' û girtina Enstîtûya Kurdî... R7

> Referandûm, çira 'Ney'?.. R10

## AKP'ê nimêj jî kir delîla sûc

Daraza tirk 5 HDP'iyên li Manîsayê nimêja înê eda kiriye û li ser medyaya civakî wêne parve kirine bi hinceta propagandaya rêxistinê ew girtin. Li aliyê din qeyûmê Şaredariya Mêrdînê jî di bin navê 'Konferansa olê' de pere diziye... RÛPEL - 3/6



QEYÛMÊ AKP'Î CIZÎRÊ TALAN DIKE

## AKP mirovên xwe digire kar

Qeyûmên ji aliyê AKP'ê ve tayînî ser şaredariyê hatine kirin bûne kûklayên di destên AKP'ê de

Li Şaredariya Cizîrê ku qeyûm lê hat bicihkirin, biryara wergirtina karkeran ji aliyê baskên AKP'ê yên jin û ciwanan ve tê dayîn. Personelên AKP'î her wiha nayên kar û kar bi giranî li ser milê karkerên din dimîne... RÛPEL - 6

**ENDAMA PLATFORMA JINAN** a Edenyê Derya Çîçek Nar di operasyona li dijî HDP'ê ya di 19'ê kanûna 2016'an de bi hinceta parvekirinên wê yên li ser çapemeniya civakî hat girtin û ji girtîgeha Tarsusê ya Jinan hat tehliyekirin. Nar pêvajoya girtina xwe ya meh û nîvekê vegot. Nar da zanîn ku di dema pêvajoya çareseriyê de hinek pirsgirêk parve kirine û wê demê ne sûc bûye û wiha got: "Piştî 2016'an bû hinceta girtinê. Darazê bêalîbûna xwe bi tevahî winda biriye. Di pêvajoya binçavkirinê de maşîneyên zirxî stranên nîjadperest didan guhdarkirin. Ez 7 rojan di bin çavan de mam û şîdeta psîkolojîk û fîzîkî her saniye dihat kirin. Parêzerê me jî tê de her kes hatibû binçavkirin. Ji bo ku em xwe biparêzin tu maf nedidan nasîn. Parêzerê me kelepçeya ters qebûl nekir û li ser vê bi saetan polîsan îşkence lê kir. " Nar bal kişand ser girtina xwe û wiha behsa zehmetiyên girtîgehê kir: "Jinên li girtîgeha Tarsusê bi gelek zor û zehmetiyan re rû bir û ne. Ji ber ku êzingan zêde nadin ava serşûştinê tune ye. Di koguşên 45 kesî de 85 kes diman." **EDENE – ŞÛJIN**



# Ev biryar sedema serhildanê ye




**Doza ku der barê kuştina 3 jinên kurd ên siyasetmedar de hat vekirin, bêyî ku bê dîtin betal bû. Hinceta betalkirinê jî mirina Omer Guney e. Jinên kurd got ku ev biyrar sedema serhildana jinan e**

Siyasetmedarên kurd ên jin Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez di 9'ê Çileya 2013'an de li Parîsa Fransayê hatin kuştin. Der barê cînayeta 3 jinên kurd ên siyasetmedar de doz hat vekirin. Lê doza ku hat vekirin bêyî bê dîtin betal bû. Çavkaniyên edlî yên ku ji Reutersê re axivîn, diyar kir ku doza piştî cînayetên Cansiz, Dogan û Şaylemez hat vekirin, piştî bersûcê dozê Omer Guney mir, betal bû. Beriya rûniştina dozê 36 roj berê bersûc Guney, di 17'ê kanûnê de mirî hat dîtin.Heke nemira dê derketa pêşberî dadgehê. Rûniştina dozê dê di 23'yê Çile û 24'ê Sibata 2017'an de bihata dîtin.

**ŞERMEZAR KIRIN**

Ji bo ku van hewldanên nixumandina doza komkujiya Parîsê şermezar bikin, kurdistanî bi pêşengiya jinên kurd li gelek welatên Ewropayê daketin qadan.

Li paytexta Almanya Berlînê, ji bo ku Komkujiya Parîsê şermezar bikin û balê bikişînin ser doza komkujiyê, kurdistaniyan mîtîngek li dar xist. Girseya gel bi vê armancê li ber avahiya Sefaretxaneya Bilind a Fransayê li hev civiya û hewldanên nixumandina ser komkujiyê şermezar kirin. Her wiha li bajarê Hamburg ê Almanyayê jî komkujî hat şermezarkirin.

**DÊ LI QADAN BIN**

Li bajarê Toulousê yê li Başûrê Fransayê, Navenda Civaka Demokratîk a Kurd tevî Kolektîfa Piştgiriya Gelê Kurd bi heman armancê meşek organîze kir. Girseya gel piştî gera li nava bajêr, li Qada Capitol vegeriya û li vir daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Dirêjkirina dema destpêkirina dadgehê û mirina kujer Omer Guney dê tu carî gelê kurd ji daxwaza edaletê venegerîne. Em wek jinên kurd ên ku li bajarê Toulousê dijîn, heta ku ev komkujî bê ronîkirin, em ê bi daxwaza edaletê her tim li qadan bin.

Ji aliyê Meclisa Jinên Kurd a Sêvê ve jî li ber konsolosxaneya Fransayê ya li paytexta Danîmarka Kopenhagenê mîtîngek hate lidarxistin. *ANF*

# Armanc azadiya Ocalan e

Rêxistina herî bilind a jinên wargeha Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) Meclisa Îştarê di çarçoveya rêzeçalakiyên ku dê heta salvegera komploya navneteweyî 15'ê Sibatê berdewam bikin de, li Salona Konferansê ya Wargeha Mexmûrê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daxuyaniya çapemeniyê da.



Di daxuyaniyê de bal kişandin ser rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku 17 sal in di bin tecrîdeke girankirî de tê girtin û wiha hat gotin: "Rêbertiya Tevgera Azadiya Kurd ku bi afirandina hebûna gelê kurd a li ser koka xwe bûye hişmendiya neteweya demokratîk, bi komploya emperyalîzma navneteweyî û kurdên hevkar ên xwefiroş, ev 17 sal in Rêbertiya me di nava çar dîwarên Zîndana Îmraliyê de ye. Ev der cihê şerê taybet ê armanca tunekirinê ye. Rêbertiya me li Îmraliyê di şert û mercên pir giran de, di nava tecrîdê de tecrîd dikin û dîl tê girtin."

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku ew jî wek Meclisa Îştar a Wargeha Mexmûrê, bi şîara ew ê bi ser bikevin didin diyarkirin ku ji niha û pê de hemû çalakî û rêzeçalakiyên ku ew dikin û tenê armanc û hedefa wan a sereke ew e ku di zûtirîn demê de bigihîjin Rêbertiya xwe û ew azadiya Rêbertiya xwe mîsoger bikin.

Di daxuyaniyê de herî dawî jinan got ku ew bang dikin ku hemû kolan û bajaran bikin cihê serhildan û berxwedanê. ***MEXMÛR - ROJNEWS***

# Rêya jiyana hevpar nîşan dide

Jinên ku tev li dewreya perwerdehiyê ya Vîyan Amara ku li bajarokê Rimêlanê dest pê kir bûne, diyar kir ku jinan çanda xwe ya dîrokî û resen bi keda xwe parastiye û got: "Jiyana azad bi destê jinan tê avakirin, perwerde jî rêya jiyana hevpar nîşanî me dide."



Endama dewreyê Evîn Şêro da zanîn ku ew tev li gelek dewreyên perwerdehiyê bûye û wiha axivî: "Lê me hîna dewlemendî û rastiya jinan fêm nekiribû. Di vê perwerdehiyê de me gelek xalên girêdayî jinan fêm kirin. Jina ku çand ava kiriye, jina dayik û xwedawend ku bi rêya desthilatdaran afirîneriyên wê jê hatine dizîn, me rastiya van xalan hemû nas kir."

Endama dewreyê Narîman Temo jî bi lêv kir ku ji bo ji nû ve kesayeta xwe ava bike tev li perwerdehiyê dibe û wiha got: "Beriya şoreşê me rastiya gelek tiştan nizanîbû, lê niha bi tevlîbûna perwerdeyan em digihîjin kûrahiya wan rastiyan. Jiyana azad bi destê jinan tê avakirin. Ji bo wê divê em wê jiyanê ji xwe re esas bigirin." Hêvî Ehmed jî anî ziman ku armanca tevlîbûna perwerdeyê hem hînbûn hem jî hînkirin e û wiha axivî: "Ji bo serkeftinê pêwîstiya sereke bi perwerdeyê heye." ***RIMÊLAN - ŞÛJIN***

# Jin civak bi xwe ye

Li Taxa Şêx Meqsûd a bajarê Helebê jin di hemû qadan de xwe bi rêxistin dikin. Endamên MSD'ê behsa berxwedana jinan a taxê kir û birêxistinbûna jinan nirxand. Endama Rêveberiya Dibistana MSD'ê Leyla Xalid diyar kir ku ew li taxê 35 jin cihê xwe di nava MSD'ê de digirin.

Xalid anî ziman ku li taxa Şêx Meqsûd jinan berxwedaneke mezin nîşan daye û wiha domand: "Li hemberî taxa Şêx Meqsûd êrîşên hovane pêk hatin, jinên li taxê pêşengiya berxwedana bêhempa kir. Jina birêxistinkirî her dem pêşenga berxwedanê ye. Ya ku hişt Şêx Meqsûd li ser piyan bimîne hêza berxwedana jinan bû ku hêzeke mezin da hemû civakê. Em gelekî kêfxweş in ku ev qas hevalên me yên ereb tev li kar bûne. Banga me ji bo hemû jinan ew e ku em bi hev re bikarin civakeke azad û wekhev ava bikin."

Jina ereb Necla Hemze jî ku cihê xwe di nava jinên MSD'ê de digire wiha got: "Ez ji Helebê me, em hemû pêkhate li vir bi hev re dijîn û dixebitin. Di dema dorpêçkirina taxê de, me gelek kiryarên kirêt ji destê çeteyan dîtin. Me hêza xwe ji jinên kurd girt, ji ber ku ew niha di çeperên şer de cihê xwe digirin û xwe bi hêz kiriye. Em jinên ereb, kevneşopiyên civakê bandorê li me dikin, ji ber vê em hewl didin ku em bibin wekî jinên kurd. Ji ber ku jin ne tenê nîviya civakê ne, jin civak bi xwe ye." ***HELEB - ŞÛJIN***

## Jinên Îzmîrî:


## Em ê li dijî hişmendiya mêran bibêjin "NA"

Daxwaza guhertina 18 xalên makeqanûnê yên erk û peywira serokomar zêde dikin û meclisê bê peywir dihêlin bi 339 dengên AKP û MHP'ê hat erêkirin. Piştî daxwaza guhertina xalan li bendê ye ku di meha Nîsanê de referandûm pêk bê. Li dijî erêkirina meclisê bertek û nerazîbûnên saziyên demokratîk, rêxistinên jinan û komeleyên hiqûqnas, parazvanên mafên mirovan zêde dibin. Nûnerên saziyên jinan ên Îzmîrê bertek nîşanî erêkirina meclisê ya guhertina van xalan dan û anî ziman ku ew dê li dijî feraseta mêran a serdest û yekperest bibêjin 'na' û li dijî vê ferasetê dê xebata 'na'yê bi rêxistin bikin.

Endama Meclisa Jinên Sosyalîst Bêrîtan Altun diyar kir ku ew ê di referandûma makeqanûnê de bibêjin "na" û wiha got: "Em dê bi xebat û hewldana xwe destûrê nedin ku makeqanûn bêtir bibe qada hişmendiya mêran a serdest û yekperest."

Endama Kolektîfa Jinên Zanîngehê Emine Akbaba jî anî ziman ku ew dê li dijî îktîdara AKP'ê ku xwe bi zilm û xwînê li ser pêyan dihêle û li dijî dîktatoriya yekmirovî ku bi zilmê dixwaze dîktatoriya xwe biparêze bibêjin 'na'.

Akbaba, da zanîn ku ew ê li kolanan dengê xwe bilind bikin û bibêjin "Bila qesra te bi ser serê te de xera bibe û ji bo dengê "na" xebata birêxistinkirinê bimeşînin û wiha got: "Em ê li dijî kuştin, şer, tundî, dijminatiya jinan ji bo welatekî azad em ê bibêjin 'na'." İZMÎR – DÎHABER



## Ayla Akad Ata ji doza 8'ê Adarê beraet bû

Rûniştina doza Berdevka KJA'yê Ayla Akad Ata ku ji ber axaftineke di 8'ê Adara 2013'an de li Silopiyê kiribû bi hinceta, 'li hemberî qanûna meş û xwepêşandanê muxalefetek kiriye' li 1'emîn Dadgeha Cezayên Silhê ya Silopiyê hat dîtin. Parêzerên Atayê Gulşen Ozbek û Zozan Açar tev li rûniştinê bûn. Parêzer Gulşen di parastina xwe de got ku armanca pîrozkirina 8'ê Adarê li Silopiyê jî wekî her dera cîhanê ye û ew beraeta muwekîla xwe dixwaze. Piştî parastina parêzer Zozan heyeta dadgehê biryara beraetê da. ŞIRNEX - ŞÛJIN

## YPS: Li Amedê 10 polîs hatin kuştin

Koordînasyona Giştî ya YPS'ê li ser encamên çalakiyên li Amedê daxuyaniyek weşand. Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayîn: "Roja 16'ê çileyê li cihekî nêzî Zanîngeha Dîcleyê ya li navçeya Sûr a Amedê, yekîneyên me li dijî otobuseke hêzên polîsan a di rê de bû çalakî pêk anî. Ev çalakî bi wesîleya 1'emîn salvegera damezirandina YPS'ê û ji bo bîranîna endamên me Bager, Zanyar û Dirêj ji aliyê Tîma Tolhildanê ya Şehîd Delîl ve hate lidarxistin.Li dijî otobusa polîsan a di rê de bû çalakiya sabotajê hate lidarxistin û di encamê de otobus bi giranî îmha bû. Di çalakiyê de 8 polîsên Qesrê hatin kuştin, 8 jî birîndar bûn ku rewşa 3 kesan giran e. Bi vê çalakiyê re, baskekî din ê yekîneyê, li polîsên ji bo teqwiyeyê hatin ji cihekî nêz ve lê dan. Piştre derbên xweş li tîmên taybet ên polîsan jî hat xistin. Li vir 2 polîsên tîmên taybet hatin kuştin, 8 jî birîndar bûn." **AMED - ANF**

# Nimêja înê jî sûc e!

**Li Tûrgûtlûyê 5 kesên bi hinceta parvekirinên civaka medyayî hatin girtin, delîlên der barê wan de skandal in. Edakirina nimêja înê, wek propagandaya rêxistinê hat hesibandin**



Li navçeya Tûrgûtlû ya Manîsayê, endam û rêveberên HDP'ê Ersin Yaşar, Sabir Guler, Maşallah Temel, Abdulvahap Çelik û Memduh Dinekli yên di 24'ê kanûna 2016'an de hatin binçavkirin, piştî 25 rojên binçavkirinê sewqî Dadweriya Cezayê Sulhê hatin kirin û ji ber parvekirinên civaka medyayî, bi îdiaya "Propagandaya rêxistinê hatin girtin. 5 kesên demek dirêj li muduriyeta polîsan hatin ragirtin û nehiştin parêzerên wan jî bi wan re hevdîtinê pêk bînin, li dadgehê delîlên derketin pêşiya wan balê dikêşin.

Abdulvahap Çelik, ji ber wêneyê xizma xwe Ruken Demir a demek dirêj e agahî jê wernagirin, li ser hesabê xwe yê civaka medyayî parve kiriye, ew wêne wek delîla sûcî hat hesibandin.

Her wiha, di lêpirsînê de Nimêja Înê ya Sivîl ku beriya hilbijartina 2011'an bi beşdarbûna namzedê parlementeriyê Osman Ozçelik li zeviyekî vala hat edakirin jî derket pêşiya Çelik. Li zeviyekî vala bi awayekî tomerî edakirina Nimêja Înê wek "Propagandaya rêxistinê" hat nirxandin.

Maşallah Temel, di sala 2012'an de ji bo xebatê wek karker çû bajarê Duhokê yê Herêma Kurdistana Federal, lê ev çûyîna wî wek sûc hat hesibandin.

Memduh Dinekli, ji ber wêneyên kurê xwe Ferhat Dinekli yê di Mijdara sala çûyîn de li Cizîrê hat qetilkirin parve kiriye, ev parvekirin sûc hat hesibandin. Axaftinên Dinekli yên di merasma cenazeyê kurê xwe de kiriye jî di dosyeyê de cih girtin û Dinekli di parastina xwe de destnîşan kir ku parvekirina wêneyên kurê wî wek ne sûc e.

Heyeta dadgehê, diyar kir ku her 5 kes "Propagandaya rêxistinê" kirine û biryara girtina wan da û ew şandin Girtîgeha Manîsayê. ***MANÎSA - DÎHABER***

## Li dijî îşkenceyê ÇALAKÎ

Bi OHAL'ê re li girtîgehan, li dijî girtiyên siyasî her diçe binpêkirina mafan zêde dibe. Li Girtîgeha Tîpa T a Hejmara 2 û 4'an ên Şakranê û li Girtîgeha Jinan a Şakranê binpêkirinên mafan gihîştiye asta herî jor. Ji Înîsyatîfa Piştevaniya Bi Zindanan Re Selma Altan a di nav heyeta ku li Girtîgeha Şakranê bi girtiyên jin û mêr re hevdîtin pêk anî de cih girt got ku li girtîgehê binpêkirina mafan hatiye asta îşkenceyê.

Altan diyar kir ku destguvaştina girtiyan a bi malbatên hatin hevdîtinê wek hincet hat nîşandan û ji aliyê gardiyanên ku kincên robokopî li xwe kirine bi awayekî giran hatine derbkirin.

Altan destnîşan kir ku li Girtîgeha Jinan a Şakranê jî lêgerîn veguherîne rewşeke rûtîn ev tişt got: "Polîs bi şev bi ser koguşên jinan de digirin. Bi zanebûn amûrên girtiyan tên belawelakirin, pêl wan tê kirin. Girtiyên li dijî vê dertên jî rastî cezayê dîsîplînê tên, înfaza wan tê şewitandin."

Her wiha li dijî binpêkinên mafan û zextan girtî diyar kirin ku wan çalakiya "derneketina hevdîtinan" dane destpêkirin. ***ÎZMÎR - DÎHABER***

## Ew roj dîsa paşve hatin

Di salên 1990-1992'yan de hêzên dewleta tirk herêma Botanê ji xwe re kir hedef û bi tang, top û tîmên wek JÎTEM û Hîzbulkontrayê dagir kir. Piştî ku van hêzan xwe li herêmê bi cih kir di bin navê JÎTEM'ê û Hîzbulkontrayê de li Şirnex û navçeyên wê dest bi qetlîaman û zilmê kir.

Hêzên dewletê li her bajarê kurdan qetlîam pêk anîn û bi hezaran kes kirin kiryar nediyar. Ji van kesan serokê HADEP'ê yê Silopiya Serdar Taniş û Rêveberê HADEP'ê yê Silopiyê Ebûbekir Denîz di 25'ê Çileya 2001'ê de hatin windakirin û heta niha ji her du kesan tu agahî nehatine wergirtin.

Malbatên rêveberên HADEP'ê Denîz û Taniş ku di 2001'ê de hatin windakirin diyar kirin ku di ser roja salvegera wan de ew roja hatine windakirin careke din dijîn û daxwaza aqûbeta zarokên xwe kirin. Hevjîna Ebubekîr Denîz, Dîvan Denîz wêneyê Taniş û Deniz ê bi diwêr ve daliqandî daniye ber xwe û ev 16 sal in çavê wê li riya hevserê wê ye. Dîvan Denîz, anî ziman ku her roja ku salvegera wan tê weke ku ji nû ve hatine windakirin.

Bavê Serdar Taniş, Şuaip Taniş jî da zanîn ku ji bo ew li aqûbeta kurê xwe bizane serî li hemû saziyên dewletê daye, lê wî di nava 16 salan de tu encam bi dest nexistiye. Taniş got ku dema kurê wî bûye endamê HADEP'ê tu kesî ji ber Levent Ersoz cesaret nedikir ku bêje ez ê serokartiya HADEP'ê bikim." ***ŞIRNEX - DÎHABER***

## Newala 9 mehî bêyî Remziyeyê dijî

Li navçeya Îpekyolûyê ya Wanê, polîsan di 19'ê nîsana 2016'an de avêtibû ser maleke li taxa Xaçortê û jina bi navê Remziye Bor a ducanî birîndar kiribû û hevjînê wê Îrfan Bor jî girtibû. Remziye Bor li nexweşxanê piştî tedawiya 27 rojan, zaroka wê Newal çêdibe û Remziye jiyana xwe ji dest da. 9 meh di ser bûyerê re derbas bûn lê tu kes nehat darizandin. Li gel ku 9 meh derbas bûn jî nedîtina kujerên Remziyeyê li aliyekî, di îdianameya ku ji aliyê serdozgeriya komarê ve hat amadekirin de hat destnîşankirin ku "ji ber dikeve endamtiya rêxistinê pêdivî bi şopandinê tune ye" û pêdivî bi lêpirsîna endamên cemaweriyê nehatiye dîtin.



Newala 9 mehî ligel dapîra xwe Kiymet Abî dijî. Abî qala zehmetiyên mezinkirina zarokên bê dayîk û bav kir û got ku ji ber kujerê Remziye hîna ne diyare ew pê dêşe.

Abî anî ziman ku Remziye li pişt xwe Newal hêştiye û wiha got: "Newal hîna 9 mehiye, dayika wê miriye û bavê wê di girtîgehê de ye. Meta Newalê bi her tiştî wê re mijûl dibe. Dilê min dêşe, ez nikarim li rûyê Newalê binêrim. Newal şîrê dayîka xwe jî venexar. Kurê min pir dixwest Newal bibîne, li ser daxwaza wî me Newal bir girtîgehê. Bavê xwe hembêz kir û bernedida. Wekî ku bavê xwe nas dikir, hîsek wiha da avakirin. Heya hevdîtin qediya ez giriyam. Xwedê vê yekê qebûl neke. Tenê daxwaza min ew e ku faîlê bûyerê bên darizandine." ***WAN - ŞÛJIN***

## Dê mirina karkera jin bê lêkolînkirin

Doza karkera malê Rukiye Şîmşek ku di sala 2013'yan de li Bostanciya Stenbolê ji paça mala ku paqij dikir ket û jiyana xwe ji dest da li 26'emîn Dadgeha Cezayê Asliyê ya Anadoluyê ya li Kartalê ye hat dîtin. Parêzera malbata Şîmşek Sevgî Evren û Sendîkaya Karkerên Malê ÎMECE tevli rûniştina dozê bûn.

Parêzer Sevgî Evren, diyar kir ku beriya niha rapora ku ji aliye pisporên Tendirûstiya Kar û Ewlehiya Kar ve hatiye amadekirin pêşkêşî heyeta dadgehê kirine, divê rapor li ber çavan bê girtin.

Heyeta dadgehê biryar da ku ji bo kêmaniyên di navabera rapora heyî ya di dosyayê de û mutalaya kesê heyîn bên derbaskirin, bi armanca îtîraz bên nirxandin, dosya ji bilî kesên heyî ji bo radestî pisporên heyeta ji Ewlehiya Kar bê kirin, rapor bê amadekirin doz taqolî 23'yê Gulanê kir.

Piştî dozê xizmên Şîmşek, parêzer û Sendîkaya Karkerên Malê yên ÎMECE li ber dadgehê hatin cem hev, dirûşmên "Ne qezaya kare cînayeta kare" û "Ji bo Rukiye Şîmşek edalet" berzkirin. ***STENBOL - DÎHABER***

## Daxwaza pisporan careke din hat redkirin

Doza facîa a Somayê ku di encamê de 301 karkeran jiyana xwe ji dest dabûn û 6 jê girtî 46 kes tên darizandin 15'emîn rûniştin wê li Dadgeha Cezayê Giran a Akhîsarê hat dîtin. Di doza ku kesên girtî û parêzerên wan û parêzerên gazîndkeran tê de amade bûn de nûnerên partiyên siyasî, civaka sivîl û malbatên karkeran amade bûn.

Di dozê de daxwaza parêzeran a rapora pisporan bê girtin û pispor di rûniştina dozê de bên guhdarkirin hat redkirin.

Parêzerê bersûc Can Gurkan Kadîr Çetîn di roja duyemîn de xebata bi mijara "Ceribandinên li ser birîqîna metalan" peşkeş kir. Dadgehê destpêkê ev belge xwend. Piştî xwendina belgeye dozgerê dozê mutalaya xwe da. Dozger di mutalaya xwe de, xwest ku kesên girtîne, rewşa wan ê girtî bidome, kesên pispor û doktor bên guhdarkirin, raporek nû bê girtin, girtina Alp Gurkan û Mustafa Yîgît û daxwaza bi zorê anîna Alp Gurkan, Mustafa Yîgît, Hayrî Kebapçılar, Haluk Evînç û Murat Bodur red kir. ***MANÎSA - DÎHABER***

www.arsivakurdi.org

## Rastgir li dijî Maduro qels dibin

**LI VENEZÛELAYÊ** xwepêşandanên muxalefeta rastgir ên ji bo têkbirina serokdewlet Nicolas Maduro qels derbas bûn. Muxalefeta rastgir a Venezûelayê serokdewlet Maduro berpirsyarê qeyrana aborî ya welat dibîne û ji bo vê yekê li dijî Maduro demeke dirêj e xwepêşandanan li dar dixe. Beriya çend rojan muxalefeta rastgir li dijî Maduro banga xwepêşandanan kir û li ser vê bangê li paytext Caracasê xwepêşandanek hate lidarxistin, lê belê tenê 2 hezar kes tev li xwepêşandanê bûn. Par li paytexta Caracasê xwepêşandaneke bi heman rengî bi tevlîbûna nêzî mîlyonek kesî pêk hatibû. Li bajarên din jî xwepêşandanên protestoyî hatin lidarxistin, lê tevlîbûna li van deran jî tê gotin ku gelekî kêm bûye û tenê bi sedan kes tev lê bûne. Muxalefeta rastgir dixwaze di nav vê salê de hilbijartinên pêşwext bên kirin. CARACAS



## O'Neill bû seroka Sinn Feinê

Piştî ku serokê Partiya Komarger a Îrlandaya Bakur Sinn Feinê Martin McGuiness ji ber krîza siyasî û pirsgirêkên xwe yên tenduristiyê hefteyek berê îstifa kir, wezîra tenduristiyê Michelle O'Neill bû serokê Sinn Feinê. Di dîroka Sinn Feinê de cara yekemîn jinek bû seroka Sinn Feinê. Li Îrlandaya Bakur dê di 2'yê Adarê de hilbijartina pêşwext pêk were û Sinn Fein bi serokatiya O'Neill bikeve hilbijartinan. DUBLÎN

## Wezîriya Tillerson hat erêkirin

Rex Tillerson ê ku ji aliyê serokê Amerîkayê Donald Trump ve ji bo Wezareta Karên Derve namzet hatibû nîşandan, ji aliyê senatoyê ve hat erêkirin. Dengdan li Komîteya Têkiliyên Derve ya Senatoyê pêk hat. Navê Tillerson dê pêşkêşî dengdana Civata Giştî ya Senatoyê bê kirin. Ji ber ku piraniya senatorên li civatê endamên Partiya Komarger in, tê gotin ku li pêşiya wezîrbûna Tillerson tu astengî nemane. WASHINGTON

## Li Fransayê çete ketin ber lêpirsînê

Li Fransayê hezar û 236 kes ji ber ku têkiliyên wan bi terorîzmê re hene, der barê wan de lêpirsîn hat destpêkirin. Hat ragihandin ku 355 kesên der barê wan de lêpirsîn hatiye destpêkirin, hatine girtin û yên mayî jî bi biryara girtinê li wan tê gerîn. Her wiha hat diyarkirin ku piraniya van kesan li Sûriye û Iraqê tev li komên cihadîst ên ku ji aliyê Tirkiyeyê ve tên birêxistinkirin bûne û endamên DAIŞ'ê ne. PARÎS

## Almanya penaberan dersînor dike

Almanya li gel ku li Afganistanê di navbera artêşa afgan û çeteyên Talîbanê de şerekî dijwar heye jî, bi hinceta ku ewlehî lê heye, bi awayekî komî penaberên afgan dersînor dike. Li Almanyayê 250 hezar penaberên afgan hene û der barê hezar û 600 penaberî de biryara dersînorkirinê hat dayîn. Piştî vê biryarê 45 penaber hatin dersînorkirin. Parêzvanên mafên mirovan li dijî vê biryarê bertek nîşan dan. FRANKFURT

## Şewata daristanan nayê vemirandin

Şewata ku beriya hefteyekê li daristanên herêma O'Higginsê ya Mauleya Şîlî derket û hê jî nehatiye vemirandin û qadeke daristanê ya ji 130 hezar hektarî pêk tê şewitî. Zêdeyî 4 hezar agirkuj, endamên artêşê û bi dehan balafi'r û helîkopter ji bo vemirandina agir dixebitin û hewl didin ku şewatê vemirînin. Hat ragihandin ku ji bo vemirandina agir Meksîka û Arjantîn jî alîkariyê dikin û yekîneyên alîkariyê dişînin herêma agir. SANTIAGO

# Astanayê polîtîkaya Tirkiyeyê têk bir

**Civîna Astanayê bi xwendina danezana dewletên garantor bi dawî bû. Di danezanê de têkçûna polîtîkaya Tirkiyeyê ya Sûriyeyê derket pêş û Tirkiyeyê bi awayekî fermî serweriya rejîma Baasê qebûl kir**



Civîna Astanayê ya ku bi garantoriya Rûsya, Îran û Tirkiyeyê ji bo bidawîkirina aloziya Sûriyeyê hat organîzekirin û bêyî tevlîbuna kurdan û hêzên ku bi kurdan re li dijî DAIŞ'ê şer dikin hat lidarxistin, bi dawî bû. Di civînê di navbera aliyan de nîqaşên gelekî tund hatin kirin. Nûnerên heyeta rejîma Baasê û heyeta komên cîhadîst hev du bi çetebûn û terorîstiyê sûcdar kir.

Civîna ku bêyî tevlîbûna kurdan û hevkarên wan hat lidarxistin tenê di asta nirxandinê de ma û li şûna çareseriya siyasî tenê çareseriya leşkerî hat nîqaşkirin. Di vê çarçoveyê de di navbera dewletên garantor Rûsya, Îran û Tirkiyeyê de mekanizmayeke sêalî hat avakirin. Hat zanîn ku ev mekanîzma ji bo şopandina îhlalên agirbestê û astengkirina şer hatiye avakirin.

**DANEZAN CIVÎNÊ**

Piştî ku civîn bi dawî bû danezana ku ji aliyê dewletên garantor ve hat amadekirin ji aliyê Wezîrê Karên Derve yê Kazakistanê Kayrat Abdurahmanov ve hat xwendin. Li gorî danezanê Tirkiye têkçûna polîtîkaya xwe ya Sûriyeyê bi awayekî fermî aşkera kir. Desthilatdariya AKP'ê ya ku dijberiya xwe ya Esad di her qadê de dianî ziman, di danezanê de aşkera kir ku serweriya rejîma Baasê qebûl kiriye.

Li aliyê din di danezanê de hat aşkerakirin ku li dijî rêxistinên terorîst DAIŞ û El Nûsrayê têkoşîneke hevpar bê dayîn. Li gorî vê yekê hêzên kurd û hevkarên wan ên ku li dijî DAIŞ'ê têkoşîneke bêhempa didin li derveyî têkoşîna hevpar man e û ji ber vê yekê dibe ku di rojên pêş de li gel astengiyên Tirkiyeyê jî bi hêzên kurd û hevakarên wan re têkilî bê danîn û tev li hevdîtnan bên kirin.

**TEROR ANÎN WELAT**

Piştî xwendina danezanê serokê heyeta hikumeta Sûriyeyê Beşar El Caferî der barê civînê de axivî. Cafarî di axaftina xwe de komên cîhadîst ên hevkarên Tirkiyeyê hişyar kirin û ev tişt anî ziman: "Êdî bes e we malê gelê xwe da terorîstan û we teror anî welatê xwe." Caferî got ku civîn ji bo rawestandina şer serkeftî bûye. Serokê heyeta komên cîhadîst serçeteyê Artêşa Îslamî Muhammed Allûş jî da zanîn ku ew rola Îranê ya di pêşeroja Sûriyeyê de qebûl nakin. *AMED*

## Tirkiyeyê rastî berovajî kirin

**AJANSA FERMÎ YA** Nûçeyan a Sûriyeyê (SANA) ragihand ku heyeta dewleta garantor Tirkiyeyê di civînê de ji bo komên cihadîst li pêşiya encamgirtinan bûye asteng. Ajansê diyar kir ku heyetên rejîma Baasê û dewletên garantor Rûsya û Îran ji bo encamgirtina civînê hemfikir bûne. Ajansê di berdewamê de bal kişand ser astengiyên ku ji aliyê heyeta Tirkiyeyê ve hatin derxistin û agahî parvekirin: "Heyeta Tirkiyeyê ji bo plan û hedefên komên cîhadîst ên di bin kontrola xwe de xwe rastî berovajî kirin û di nav hewldanên ferzkirinê de ma."

# Li Îdlîbê çete bi hev ketin

Li Bajarê Îdlîbê yê Sûriyeyê di navbera çeteyên Ahrar'ûş Şam û Cûndûl Aksayê de şer û pevçûn derketin. Hat ragihandin ku şer û pevçûn ji ber ku çeteyên Ahrar'ûş Şamê serçeteyekî çeteyên Cûndûl Aksayê girtine di navbera wan de şer û pevçûn derketine. Çeteyên Cûndûl Aksayê yên ku êrîş birin ser çeteyên Ahrar'ûş Şamê çend serçeteyan wan destserkirin.

Hat ragihandin ku bi armanca şer û pevçûnên di navbera çeteyan de bi dawî bibe çeteyên Feth El Şamê (EL Nûsra) dest bi navberkariyê kirine û hewldanan wan bê encam maye û şer û pevçûnên di navbera her du komên çeteyan de bi awayekî dijwar berdewam dikin.

Li ser vê yekê koma çeteyan a Feth El Şamê (EL Nûsra) biryar da ku çeteyên Cûndûl Aksayê di bin banê xwe derxe. Her wiha hat ragihandin ku li herêma di navbera çeteyên Ahrar'ûş Şamê û Abû Fatih Argalî de jî şer û pevçûn derketine. *ÎDLÎB*



## Li Îranê 507 kes hatin bidarvekirin

Rêxistina Mafê Mirovan ya Îranê der barê binpêkirinên mafên mirovan yên 2016'an ên li Îranê de raporekî aşkera kir. Di raporê de tê ragihandin ku di 2016'an de li seranserê Îranê 3 hezar 439 binpêkirinên mafê mirovan hatine tomarkirin.

Di raporê de hatiya ragihandin ku ji kêm netewan 366 kes hatine girtin û 996 meh cezayê girtîgehê li 70'ê kesî hatiye birîn û biryara lêdana 4 hezar 105 qamçî, li 554 kes hatiye birîn. Li gorî raporê binpêkirin û zextên li ser girtiyan li gorî sala 2015'an ji sedî 8 zêdetir bûye. Hûkmê zîndankirinê ji aliyê dezgehên darizandinê yên Îranê ve ji sedî 95 zêde bûye. Ev bîlanço dide nîşandan ku ji sedî 40 binpêkirinên mafê mirovan di sala derbasbûyî de li Îranê zêdetir bûye.

Binpêkirin û astengiyên li hemberî jinan jî di 2016'an de ji sedî 46 zêde bûne. Di raporê de tê ragihandin ku di 2016'an de ji 457 kesan re cezayê darvekirinê hatiye birîn û 507 kes jî hatine darvekirin. Ji van 33 kes jî li pêş çavê her kesê li qadan hatine darvekirin. *TEHRAN*

# Dadgeha Bilind a Brîtanyayê biryara Brexite da

Dadgeha Bilind a Brîtanayayê der barê pêvajoya Brexitê ya ji veqetandina Yekitiya Ewropayê (YE) de biryar da ku hikumet ji bo nirxandina pêvajoya Brexitê destûr ji parlamentoyê wergire. Hat ragihandin ku serokê Dadgeha Bilind a Brîtanayayê li hemberî 3 dengên na bi 8 dengên erê ev biryar girtiye. Her çiqas dadgehê bi vê biryarê encama referandûmê tunehesibandibe jî çawaniya cudabûna Brîtanyayê ya ji YE'yê diyar kir.

Hikumeta Brîtanyayê di xwest bi xala 50'emîn a Peymana Lîzbonê ku derketina ji YE'yê saz dike bixe meriyetê û bêyî erêkirina parlamentopyê dest bi hevdîtinan bike. Her wiha di mijdara 2016'an de jî biryar hatibû dayîn ku hikumeta Brîtanayayê bêyî erêkirina parlamentoyê nikare dest bi hevdîtinên Brexite bike. Wê demê hikumet li dijî vê birayarê derketibû. *LONDON*

www.arsivakurd.org

# Bi felsefeya Ocalan ketine rê

**Hevseroka Konseya Rêveber a Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Foza Yûsif di civîna li Qahîreyê de axivî û aşkera kir ku ew bi felsefeya Ocalan pergala gelên herêmê ava dikin û dê gel bi vê felsefeyê azad bibe**



Ji bo danasîna Federasyona Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê, bi tevlîbûna nûnerên federasyonê û gelek akademîsyen, nivîskar û rojnamevan li Qahîreyê semînerek hat lidarxistin û 3 rojan dom kir. Semîner li Navenda Lêkolînê ya Kurd a li paytexta Misrê li Qahîreyê pêk hat.

Semîner bi moderatoriya hîndekarê Zanîngeha Misrê Dr. Cemal Yûsûf pêk hat. Hevseroka Konseya Rêveber a Federasyonê Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Foza Yûsûf bi rêya telekonferansê û Serokê Navenda Lêkolînê ya El Misrî Recaî El Fayed wek axaftvan beşdarî semînerê bûn.

Foza Yûsûf bal kişand ser hesasiyetên pêvajoya heyî û li ser biryara Federasyonê ev tişt got: "Gelên bakurê Sûriyeyê; kurd, ermenî, tirkmen, çerkez û ereb, ji bo ji vê kaos û krîzê rizgar bibin, li rêyekê digerin û li dijî êrîşên siyasî û leşkerî ev modela çareseriyê derxistin holê."

Foza aşkera kir ku armanca bingehîn a federasyonê afirandina civakeke azad e û piştrast kir ku ew yekparebûna Sûriyeyê diparêzin.

**FELSEFEYA OCALAN**


Foza got ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan îdeolog, pisporekî baş ê herêmê ye û destnîşan kir ku wan sûd ji felsefeya Ocalan girtine û wiha axivî: "Nêrînên birêz Ocalan li ser avakirina civakeke azad e. Di heman demê de li ser bingeha avakirina neteweyeke demokratîk e. Em jî di wê baweriyê de ne ku ancax bi vê felsefeyê civak dikare bi hev re bijî."

**KRÎZÊ KÛR DIKIN**

Dr. Cemal Yûsûf Abdulhamît jî da xuyakirin ku di nava hemû karên ji bo çareseriya pirsgirêkên li Sûriyeyê de, lazim e kurd ji sedî sed hebin û pirsgirêk beyî kurdan çareser nabin. Abdulhamît da zanîn ku hêzên li herêmê û navneteweyî, ji bo pirsgirêka herêmê girantir bibe, kurdan ji civînan dûr dixin û wiha pê de çû: "Hevdîtina Astanayê mînakek vê yekê ye. Armanca yekane ya Tirkikyeyê, dewamkirina krîza li Sûriyeyê ye. Ji ber vê yekê planên gelekî qirêj û xetere li dijî kurdan dike."

Serokê Navenda Lêkolînê ya El Misrî Recaî El Fayed jî destnîşan kir ku kurd ji her kesî bêhtir yekparebûna axa Sûriyeyê dixwazin. Semîner piştî axaftinan qediya. *QAHÎRE - ANF*

## Soza wan azadkirina Reqqayê ye



Fermandarê Şems Şîmal Mihemed Ebû Adil jî yek şervanê di nava berxwedana Kobanê de cih girt bû, di duyemîn salvegera serkeftina Kobanê de ji ANF'ê re axivî. Mihemed Ebû Adil diyar kir ku ruhê fedayî li Kobanê derket holê, Minbic rizgar kir. Ebû Adil bi bîr xist ku Kobanê neketiye û dê di demeke nêz de Reqqa bikeve.

Ebû Adil got ku ew ji Minbicê ye, lê Kobanê ji bo wî taybet e û da zanîn ku di sala 2011'an de gelên li Sûriyeyê bi daxwaza azadî, wekhevî û edaletê li dijî rejîma Baasê rabûne û anî ziman ku yekane daxwaza gelan, Sûriyeyeke demokratîk e. Ebû Adil diyar kir ku daxwaza gelên Sûriyeyê bi destwerdana hêzên navneteweyî û herêmî hatiye terorîzekirin.

Ebû Adil aşkera kir ku pêşengên siyasî û leşkerî yên Rojava, di heman demê de hewl dan şerê heyî ji Rojava derxin û ev yek jî di asteke bilind de bi ser xistine. Ebû Adil da zanîn ku di nava vî şerê giran de Rojava ji bo gelên Sûriyeyê bûn sitargehekê.

**XARINA TAYBET…**

Ebû Adil bîranînek di navbera wî û pêşmergeyan de jî par ve kir û wiha pê de çû: "Pêşmergeyan li pişt eniya şer, hawan davêtin çeteyên DAIŞ'ê. Ji bo wan ji Tirkiyeyê xwarina taybet dihat. Ê me, nan jî bi destê me nediket. Carna em bi rojan birçî diman."

**SOZ DAN EBÛ LEYLA**

Ebû Adil da xuyakirin ku berxwedana Kobanê hemû hevsengiyên siyasî û leşkerî yên li Rojhilata Navîn li binguhê hev xistiye û anî ziman ku bi rizgarkirina Kobanê rê, rizgariya Girê Spî, Mebrûk, Silûk, Eyn Îsa, Sirîn, Hol, Tişrîn, Şeddadê û Minbicê jî hatiye.

Ebû Adil destnîşan kir ku hêzên şoreşger ên Kobanê rizgar kirin, niha berê xwe dane Reqayê û got ku "Me soz dane berxwedêrê Kobanê Ebû Leyla. Em ê çeteyên DAIŞ'ê ji Reqayê derxînin." *ANHA*

## YPG: Biryarên Astanayê me eleqedar nakin

Fermandariya Giştî ya YPG'ê li ser danûstandinên li Astanayê daxuyaniyek weşand û diyar kir ku ew ê li gorî biryarên li wê derê bên girtin tevnegerin. YPG'ê di daxuyaniyê de got ku li paytexta Kazaxistanê li Astanayê bi sponseriya Rûsya, Tirkiye û Îranê ji bo çareserkirina aloziya Sûriyeyê civînek hat lidarxistin û di vê der barê de ev tişt got: "Em wek YPG em dibînin ku aliyên beşdarî civînê bûne parçeyek ji aloziya herêmê ne û tu projeyeke çareserî di destê wan de nîne."

YPG'ê aşkera kir ku ew di wê baweriyê de ne ku alozî bi rêya projeya demokratîk, biratiya gelan û bi rêveberiya xweser pêkan e û wiha got: "Em ji bo civîna Astanayê nehatin vexwendin. Ji ber vê em li gorî biryarên ku di vê civînê de têne girtin jî tevnagerin. Ev biryar tenê girêdayî aliyên beşdar e. Em hêvî dikin ku şerê li Sûriyeyê û rijandina xwînê bi dawî bibe, çareseriyeke demokratîk ji bo aloziya herêmê bê dîtin." *QAMIŞLO*

## Gundê Um Hicêra komîna xwe ava kir

Gelek welatiyên li gundên herêma Rojava dijîn, di her alî de xwe bi rêxistin dikin û herî zêde girîngiyê didin komîn û meclisên gundan. Şêniyên gundê Um Hicêra ji TEV-DEM'ê xwestin ku li gundê wan komîn bê avakirin. TEV-DEM'ê civînek li dibistana gund pêk anî û der barê avakirin û xebatan de bi gel re nîqaş kir.

Endamê TEV-DEM'ê Yûsif Şêxo di civînê de axivî û got ku komîn bingeha serke ya civakê ye û ev tişt got: "Gel bi rêya komînan xwe birêxistin dike û pirsgirêkên xwe çareser dike. We daxwaz kir ku em bi hevkarî komînên xwe ava bikin. Em jî wek TEV-DEM'ê hazirin bi hemû hêza xwe alîkariya we bikin."

Şêxo bal kişand ser girîngiya jiyana hevbeş û biratiya gelan jî û wiha pê de çû: "Gundê we mezin e. zêdeyî 400 malbatan li vir bi cih bûne, ji ber wê derfetên we yên komîn gelekî zêde ye." Di berdewama nîqaşan de komîna gund hat avakirin û hevserokên komînê hatin hilbijartin. HESEKÊ - ANHA



## Koçberên Reqqayê pez xwedî dikin

ELÎ FERHAN / SERÊKANIYÊ - ANHA

Desteya Çandiniyê 300 Malbatên koçer li başûrê Mebrûka bicih kirine. Malbatên koçer li wir pezê xwe diçêrînin û debara xwe peyda dikin. Desteya Çandiniyê ya Kantona Cizîrê 45 hezar donim erd ji malbatan re veqetandiniye. Koçerên ku piraniya wan ji herêmên Reqqa, Humis, Dêra Zorê û deverên din ên Sûriyeyê koçber bûne, li wir pezê xwe diçêrînin. Erdên ji koçeran re hatiye veqetandin, li başûrê bajaroka Mebrûka yê Serêkaniyê ye.

Her malbatek koçer zêdeyî 200 serî pezê wan heye. Welatiyên koçber bi hemû endamên malbatê re pezê xwe di wan zeviyan de diçêrînin. Jin, zarok û zilam bi xwedîkirina pez re mijûl dibin û ji berhemên wê peydiviyên xwe yên jiyanî peyda dikin.

Welatiyê bi navê Ehmed Elî yê 20 salî ji bajarê Reqqayê hatiye û li başûrê Mebrûka dimîne. Elî got ku ew berî sal û nîvekî hatine wir û ev tişt got: "Em jiyana xwe bi xwedîkirina pez derbas dikin. Derdora 250 serî pezê me heye. Rojane em diçin sûkên pez ên Serêkaniyê, Hesekê, Qamişloyê û pezê xwe li vir difroşin."



## Çeteyên Tirkiyeyê êrîşî Efrînê kir

Çeteyên girêdayî dewleta tirk ên li bajarê Ezazê bi cih bûne, gundê Kefer Cenê yê navçeya Şera topbaran kirin. Ev çeteyên Koalîsyona Niştimanî piştgiriya ji dewleta tirk digirin û demek dirêj e êrîşî destkeftiyên gelên li rojavayê Kurdistanê dikin. Ev çeteyên han bajarê Ezazê jî dagir kirine, gundê Kefer Cenê yê navçeya Şera ya Efrînê topbaran dikin. Çeteyan 4 top avêtin gundê Eefer Cenê. Di encama topbaranê de ziyana madî çê bû. Bajarê Ezazê ji aliyê çeteyên dewleta tirk ve hatiye dagirkirin û ev çete tevli civîna Astanayê jî bûne. EFRÎN



## Bazirganê mirovan ji Asayîşê xilas nebû

Hêzên civakî yên li rojavayê Kurdistanê nahêlin diz, kesên karên qirêj û bazirganiya mirovan dikin çavên xwe vekin. Buroya Asayîşa Girkê Legê diyar kir yekîneyên Asayîşê yên li dijî sûcê rêxistinkirî xebatê dikin, kesekî ku mirov bi rêyên qaçaxçî derdixistin derveyî Rojava girtine. Rêveberên buroyê got ku kesê bi navê A.A.Ş., dema dixwest 2 kesan bi rêyên qaçaxî derxîne derveyî Rojava ji hêla hêzên wan ve hatiye zevtkirin. A. A. Ş., piştî radestî buroya lêpirsînê hat kirin, der barê wî de lêpirsîn hat destpê kirin û dê li gorî rêgezên civakê bê darizandin. GIRKÊ LEGÊ



## HPC'ê konferansa xwe pêk anî

Hêzên Parastina Civakî (HPC) her roj xwe bi rêxistin dike. Li navçeya Şiyê ya Kantona Efrînê konferansa xwe bi beşdariya Endamên HPC ê, Kongreya Star, TEV-DEM û Endamên Saziyên Rêveberiya Xweser pêk anîn. Fermandarê HPC ê Dijwar Mardînî diyar kir ku di vê demê de rêxistinkirin û xurtkirina noqteyên parastinê girîng e. Mardînî da zanîn ku HPC ê li gel şervanên YPG/YPJ ê parastina herêmê dikin. Piştre rapora salane ya HPC ê hat xwendin, Fehîme Elî Neso û Mihemed Îbrahîm wek Hevserokên HPC ê yên navçeyê hatin hilbijartin. Konferans bi dirûşmeyên Bijî Serokê Apo bi dawî bû. EFRÎN



## Malbatên ji hev xeyidî li hev hatin

Komîteya Lihevanînê ya Kantona Efrînê nakokiya di navbera du malbatan de çareser kir. Malbatên Nîzar Kelebcik û Arif Reşîd Kelebcik ji gundê Girzîlê yê navçeya Şêrawa ya kantona Efrînê ne û ev 6 meh bû di navbera wan de nakokî hebû. Piştî Komîteya Lihevanînê ya Kantona Efrînê bi komîteya Lihevanînê ya Komuna Şehîd Munzir a gundê Girzîlê re têkilî danî, nakokiya her du malbatan hat çareserkirin. Heyeta lihevanînê da zanîn ku di vê demê de divê gelên herêmê nakokiyên di navbera xwe de çareser bikin. EFRÎN

www.arsivakurdi.org



## Li Xerpêtê 14 kes hatin girtın

Li Xarpêtê di 6'ê Çileyê de polîsan bi fermana Dozgeriya Komarê bi ser gelek malan de girt û hevserokê HDP'ê yê Xarpêtê jî di nav de 18 kes binçav kirin. Ji 18 kesên sewqî Dadgeha Sulh Ceza hatin kirin 14 kes hatin girtin û 4 kes jî bi şertê kontrola edlî serbest hatin berdan.

Kesên hatine girtin wiha ne: Hevseroka HDP'ê ya Xerpêtê Ayfer Yilmaz, rêveberê HDP'ê Nihat Akdemir, hevserokê DBP'ê yê berê yê Xarpêtê Turan Çelîk, rêveberê HDP'ê Osman Gorguluer, rêveberê HDP'ê yê Karakoçan/Sarıçanê Yusuf Koç, Bilal Yergin, Fahrettin Bingol, Gulbahar Arslan, Hasan Doner, M. Fatih Ormangoren, Yaşar Mersin, Necmettin Ersoz, Tekin Karadogan û Ayhan Dogan hatin girtin. Kesên bi navê Selahattin Yergin, Medeni Saritag, Murat Baydar û Enes Sari jî bi şertê kontrola edlî serbest hatin berdan. *XARPÊT*

## Greva karkeran bi ser ket

Karkerên endamên Sendîkayên Yekbûyî yên Metal-Îşê ku di fabrîkayên EMÎS'ê de dixebitin, ji ber greva hatiye qedexekirin bi awayekî fîilî domandin Wezareta Xebatê ket dewrê û bang li rêveberên navendên EMÎS û Metal-Îşê kir ku li Enqereyê bicivin. Li ser daxwaza rêveberên EMÎS'ê ya bi çalakiya ji kar berdanê bê rawestandin, li ser daxwaza rêveberiya navendî ya Yekbûyiyên Metal-Îşê çalakiya dest ji kar berdanê bi dawî bû.

Pitre hevdîtinên destpêkirin, heta saetên şeve berdewam kirin. Sendîkayê diyar kir k udi encamê de wan li hev kirine. Li gorî lihevkirinê, ji bo saetên pereyan ji bo 6 mehên destpêkê 1.20, ji sedî 7 zêdebûn, ji bo 6 mehên duyemîn û sêyemîn jî enflasyon û 1 puan hat zêdekirin. Tenê ji bo fabrikaya Çîglî Schneider zema 6 mehên destpêkê 1 lîra û ji sedî 7 zêde bû. Di mafên civakî de jî hat diyarkirin ji bo sala destpêkê ji sedî 27, ji bo sala duyemîn jî enflasyon û pûanek hatiye zêdekirin. *STENBOL*



# Qeyûm Cizîrê talan dike

**Şaredariya Cizîrê ku qeyûm lê hat bicihkirin, bê navber karkeran ji kar derdixin û li şûna wan AKP'iyan bi cih dikin. Li dora avahiyên dewletê ji bo 'ewlehiyê' beton tên danîn, îhale bi rengekî veşartî tên dayîn**




Piştî ku bi rêya qeyûm Şaredariya Cizîrê hat desteserkirin, karker yek bi yek ji kar hatin derxistin. 90 kes ji kar hatin derxistin û li şûna van jî 150 kesên AKP'î li şaredariyê hatin bicihkirin. Li navçeyê tu xizmeta şaredariyê nîn e, tenê bi armanca 'ewlehiyê' beton li ser rê tên rijandin, rê tên ronîkirin û kamerayên MOBESE li derdorê tên bicihkirin.

Ji ber ku personelên piştî qeyûm li kar hatin bicihkirin karê xwe nakin, bar girantir bûye. Karkerên ku gefa derxistina ji kar li wan tê xwarin, neçar tên hiştin ku karê personelên AKP'î yên nayên kar jî bikin. Gefa 'fesha şîrketê ya bi yekalî' li xwediyên fîrmayên taşeron tê xwarin û li ser wan tê ferzkirin ku karkerên xwe ji kar derxînin û li şûna wan, kesên ji aliyê qeyûm ve hatine hilbijartin li kar bi cih bikin.

Zext û gefa li fîrmayên taşeron jî gelekî zêde ye. Li ser wan tê ferzkirin ku hejmara karkerên xwe kêm bike û karê li ber dest biqedîne. Ew jî neçar dimînin karkeran derdixînin.


Cihê ku di dema şaredariya DBP'yî de weke Navenda Tenduristiyê dihat bikaranîn, niha veguherandina navenda çandê û weke avahiyek rêxistinbûna baskên AKP'ê yên jin û ciwanan tê bikaranîn. Saziya ku xizmeta tenduristiyê dida, niha weke avahiya AKP'ê ya navçeyê tê bikaranîn. Îhale kengî tê kirin, radestî kê tê kirin, nayê eşkerekirin. Hemû îhale bi veşartî tên kirin.

Piştî ku qeyûm li Şaredariya Cizîrê bi cih bû, tu xizmet nehat kirin. Tenê ji bo 'ewlekariyê' rê û kolan tên çêkirin. Ji bilî wê tiştek nayê kirin. Ji bilî bicihkirina kamerayên mobese û ronîkirina rêyan, tiştek li navçeyê nayê kirin. Ev hemû jî ji bo 'ewlekariyê' tên kirin." *ŞIRNEX*

## Şaredariya gel şêlandin

**PIŞTÎ KU QEYÛM** Şaredariya Mezin a Mêrdînê desteser kir, serokê Rêveberiya Çandê hate girtin, li şûna wî girêdayî qeyûm Yakûp Sarî anîn ser Rêveberiya Çandê. Meha kanûnê Nîhat Hatîpoglu ê îlahîyatparêz hate Mêrdînê û konferansek li dar xist. Personelekî şaredariyê ku nexwest navê xwe bide, di ber semînarê de 60 hezar lîre da Hatîpoglu. Serokê Rêveberiya Çandê jî ji bûdçeyê weke ku 400 milyar lîre dabe Hatîpoglu nîşan daye û pere li ser xwe zimet kiriye. **MÊRDÎN**

## Polîsan şaredarî dagir kir




**PIŞTÎ KU** polîsan bi ser Şaredariya Bazîdê ya Agiriyê de girt, lêgerînên hatibûn destpêkirin didomin û xebatkarên şaredariyê yên ku duh çûn şaredariyê rastî astengiya polîsan hatin. Xebatkarên ku nekarîn bikevin şaredariya di bin dorpêça polîsan de, bi hinceta 'lêgerîn didome' paşde hatin vegerandin.

Li aliyê din, 13 kesên ku di nava wan de hevşaredar Delal Tekdemîr û Murat Rohat Ozbay jî hene hatibûn binçavkirin û li Midûriyeta Polîsan a Uluyol a Bazîdê tên ragirtin. Di operasyona li navçeya Dutax a Agiriyê de jî hevşaredarê Dutaxê Firat Ozturk ku qeyûm tayînî cihê wî hat kirin û 9 kesên li gel wî hatin binçavkirin, birin Midûriyeta Polîsan a Agiriyê. Di çarçoveya operasyonê de ji ber ku 3 kesên ne li malê bûn lêgerîna wan didome. **AGIRÎ**

## Ji bo ku e-maîl deşîfre nebin

Rojnameger Omer Çelîk piştî ku 24 rojan di bin çavan de ma bi îdiaya endamê rêxistinê ye hat girtin. Parêzerê Çelîk, Ozcan Kiliç der barê girtinê de axivî.


Ozcan Kiliç anî ziman ku lêpirsîna wan a li midûriyeta polisan cuda bû û li dozgeriyê cuda bû û wiha got: "Dozger û dadger pêdivî dîtin ku li pişt vê lêpirsînê rêxistinekê bi cih bikin. Her rojnamegerek ji saziyek cuda ya çapemeniyê û weşanên wan cuda ne. Nerînên wan û nûçeyên wan cuda ne. Di destpêkê de li ser e-maîl'ên Berat Albayrak lêpirsin hat destpêkirin. Heta 20 rojên ewil me wisa zanîbû. Doza ku îfadeya wan bê girtin û em çûn midûriyetê, polîs pisporên ragihandinê bûn. Dema ez bi wan re axivîm diyar kirin ku lêpirsîn têkildarî mailên Albayrak in."



**'12 NÛÇE PIRSÎN '**

Kiliç, destnîşan kir ku lêpirsîn li dozgeriyê bi temamî hat guhertin û der barê Wezîr Albayrak de qet pirs nehatine pirsîn. Kiliç, anî ziman ku ji Çelik 12 nûçeyên serdema Kobanê pirsîne û wiha got: "12 nûçeyên Çelîk ê 1.5 sal berê li Kobanê çêkirine û parvekirinên wî yên medyaya civakî pirsîn. Dema min pirsa e-maîlên Wezîr Albayrak heye pirsî, gotin raste heye tenê pirsek dawî der barê Albayrak de bû. Lê di lêpirsînê de der barê Albayrak de tu tişt tune bû. *STENBOL*

## 'Dixwazin **BirGunê** bitirsînin'



Berpirsyarê hesabgiriya rojnameya BirGunê Mahir Kanaat, ji ber agahiyên ku Redhackê parve kirine, ew parvekirinên wî wek sûc hatin hesibandin. Kanaat ê bi îdiaya "endamtiya rêxistinê" hat girtin.

Hevala xebatê ya Kanaat û Nûçegihana BirGunê Zeynep Kuray a 10 sal e ew û Kanaat bi hev re dixebitin got, bi girtina Kanaat dixwazin rojnameya BirGunê çavtirsandî bikin. Kuray wiha anî ziman: "Peyam ev e, 'lê binihêre ez îro hesabgirê te digirim, ez ê sibê jî we hemûyan bigirim." Kuray got, çi dibe bila bibe dê rojnameger bê deng nemînin. *STENBOL*

## Siyasetmedar Ozturk hat girtin

**AMED** - Li Amed, Riha û Antalyayê 30'ê Kanûnê di serdegirtina malan de endamê MYK'ê yê DBP'ê Salîh Akdogan, endamê Meclisa Partiyê ya HDP'ê Bayram Altun, endamê PM'ê yê DBP'ê yê bere Ercan Akyol, siyasetmedar Mazhar Ozturk û rojnameger Hasan Alma hatibûn binçavkirin û bi daxwaza girtinê sewqî dadgehê hatin kirin. Siyasetmedar Mazhar Ozturk bi îdîaya "endamê rêxistinê ye" hat girtin û 4 kesên din jî bi şertê kontrola edlî hatin berdan.

## Bi ser mala Ferhat Tunç de girtin

**STENBOL** - Li hemberî siyasetmedar, hunermend, rojnamegerên kurd operasyonên binçavkirinê didomin. Polîsan bi ser mala hunermend Ferhat Tunç de girt. Tunç, ku li ser hesaba xwe ya Twitterê daxuyaniyek da, diyar kir ku ji ber ku derbarê wî de biryara bi zorê anînê heye polîsan bi ser mala wî de girtiye û wiha got: "Dibêjin li ber deriye malê polîs hene û biryara bi zorê anînê heye. Lê belê kengî kirine gazî min, ez çûme."

www.arsivakurdi.org

Medya
25 Çile 2017 Çarşem

# Gotina dawîn; NA

**HDK bi armanca di referandûmê de bibêje "na" seferber bû û dest bi xebatan kir. HDK dê bi dirûşmeya "Pêdiviya me bi serokdewletiyê tune ye. Gotina me ya dawîn 'na' ye" dakeve qadan**

Hevberdevkên Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) Onur Hamzaoglu û Gulistan Kiliç Koçyîgît, têkildarî daxwaza guhertina qanûna bingehîn ku biçe referandûmê bi rojnamegeran re hatin cem hev.

Hevberdevkê HDK'ê Hamzaoglu, bal kişand ser geşedanên li Tirkiyeyê û wiha got: "Di qada aborî ya Tirkiyeyê de devaluasyon ji sedî 30 e. Li Tirkiyeyê gel her ku diçe xizan dibe. Kriza aborî her ku diçe kûrtir dibe. "

Hevberdevka HDK'ê Gulistan Kiliç Koçyigit diyar kir ku ew dê bi ruhê seferberiyê dakevin qadan û ji bo xêrê bibêjin "na" û xwest her kes li "na"yê xwedî derkeve û piştgiriyê bide xêrê. Koçyîgit bal kişand ser pêvajoya qanûna bingehîn a 1980'an û wiha got: "Niha haya me jê tune ye ku em rastî kîjan pêvajoyê tên. Di pêvajoya 12'ê Îlonê de jî gel tev li pêvajoya guhertinê nekirin. Niha jî nerîn û vîna gel esas nayê girtin. Dixwazin Tirkiye bi hişmendî û pergala yekrêveberiyê bi rê ve bibin. Em niha di pêvajoya OHAL'ê de ku çapemenî tê girtin, nîqaşên guhertina makeqanûnê dikin. Îktîdara Tirkiyeyê dixwaze bi lezgînî rejîmê biguherîne.

**BIRÊXISTINA 'NA'YÊ**

Koçyîgît bal kişand ser guhertinên makeqanûnê û ji anî ziman ku di qanûnên hatine guhertin de vîna gel tune hatiye hesibandin û wiha got: "Em dê "na"yê bi rêxistin bikin. Em bawer dikin ku li Tirkiyeyê atmosfereke nû heye. Hêzên demokratîk ên li Tirkiyeyê dê dîsa xwe nû bikin. Em dê xwe bi rêxistin bikin û ji vê pergala ku li dijî demokrasiyê ye re bibêjin bes e. Em dê bêtir xwe bi rêxistin bikin û di vê pêvajoya dîrokî de em dê di navbera Stenbol û Amedê de ji bo 'na'yê her kesî bi rêxistin bikin."

Koçyîgît, bang li her kesî kir ku ji bo xêrê li "na"yê xwedî derkevin û "na"yê bi rêxistin bikin. *STENBOL*




## Dê 'Na' rewşê biguherîne



**HEVSEROKA HDP'Ê** Fîgen Yuksekdag, li Girtîgeha Tîpa F a Kandirayê pirsên rojnameya Cumhuriyetê bersivandin.

Yuksekdag anî ziman ku li girtîgehê tên tecrîdkirin û wiha got: "Em bi operasyonên tunekirinê re rû bi rû ne. Dixwazin bi rejîma despotîk pêşiya pêşeroka Tirkiyeyê ya îro bigirin. Îktîdara ku wextê wê temam bûye, ji bo ku hebûna xwe bidomîne, rêya 'serokomarê xwedî partî' yanî 'zilamekê, partiya rejîmê' diceribîne. Şerê ku li derve û hundir didome, di şertên OHAL û darbeyê de bingeha rejîma ku dixwazin ava dikin. Di vê rewşê de ger destûr bidin rejîma serokatiyê derbas bibe, şerê ku mayînde bûye dê bibe rejîma OHAL'ê." Yuksekdag bal kişand ser referandûmê û got ku yên dibêjin 'na' dikarin rewşê biguherînin. **STENBOL**

# Ji bo ku ceza bibirin lez dikin

Di sala 2009'an de di bin navê "KCK"ê de operasyon hatin lidarxistin û piştî van operasyonan der barê 154 siyasetmedarên kurd de doz hatibû vekirin.

Li Amedê, li Duyemîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê 71'emîn rûniştina "Doza Sereke ya KCK'ê" hat dîtin. Cîgirê hevserokatiya HDP'ê Nadir Yildirim ê ji Doza Sereke ya KCK'ê hat darizandin û 5 salan girtî ma û paşê hat berdan, diyar kir ku dixwazin demildest doza KCK'ê bi encam bikin, ceza li siyasetmedarên kurd bibirin û wiha got: "Li Tirkiyeyê tu carî nêrîna li hemberî kurdan neguheriye û di her serdemê de li dijî kurdan hiqûqa dijminatiyê heye."



Yildirim, destnîşan kir ku Doza Sereke ya KCK'ê di encama kumpaseke di navbera Cemaeta Fethullah Gulen û AKP'ê de derketiye holê û niha jî doz bi tifaqa Ergenekon, AKP û MHP'ê tê meşandin.

Yildirim wiha got: "Ev tifaq, ji bo binpêkirina mafên demokratîk ên kurdan tê bikaranîn. Kesên duh bûn yek, bûn dijminên hev lê bi îtifaqên cuda êrîşî kurdan dikin."

Yildirim, destnîşan kir ku di dema dawî de dozên KCK'ê ji aliyê AKP'ê ve bi lez û bez tên meşandin û diyar kir ku mebest ji vê ew e ku dixwazin demildest bi encam bibin, da kurdan derî siyaseta demokratîk bin. Yildirim got ku ji Dadgehên Îstîqlalê heta niha li dijî kurdan mebesta darizandinê neguheriye û dê têkoşîna xwe bidomînin û paş ve gav naavêjin. *AMED*

# Van dozgeran lêkolîn bikin



1'emîn rûniştina hevserokê HDP'ê Selahattîn Demîrtaş a ji ber axaftina wî ya li Erdîşê kiribû, der barê wî de doz hatibû vekerin û li 1'emîn Dadgeha Sulh Ceza ya Erdîşê hat dîtin.

Parlamenterên HDP'ê, endam û rêveberên HDP û DBP'ê li salonê amade bûn. Demîrtaş, bi riya SEGBÎS'ê beşdarî rûniştina dozê bû.

Demîrtaş, bi SEGBÎS'ê ji Girtîgeha Tîpa F a Edîrneyê parastin kir û got: "Ev îdîanameya pir bê cîddîyet hatiye amadekirin. Ji bo bêjin 'Ez jî ji Demirtaş re îddîanameyê amade bikin û bila xwêya min jî di vê xwarinê de hebe' hatiye amadekirin. Li vir li dijî min sûc hatiye kirin. Ez dixwazin ev dozger bên lêkolînkirin." Piştî parastinê heyetê rûniştina dozê taloqîe 27'ê Nîsanê kir.

Li aliyê din nûçegihanê DÎHA'yê yê berê Selman Keleş bi hinceta li salonê bi telefonê dîmen kişand hat binçavkirin û birin midûriyeta polîsan a Erdîşê. *WAN*

# PDK ketiye pey parçekirinê

Ev çend roj in, hinek endamên Eniya Nîştimanî ya Kurdistana Sûriyê (ENKS) di çapemeniya PDK'ê de behsa hebûna 7 hezar Pêşmergeyên Rojava dike û diyar dikin ku dê hewl bidin van pêşmergeyan derbasî rojavayê Kurdistanê bikin.

Hevserokê Nûnertiya Xwerêveberiya Demokratîk a Rojavayê Kurdistanê Dr. Cawîdan Hesen balkişand ser pergala dû îdareyî (rêveberî) ya li başûrê Kurdistanê û diyar kir ku ev pergal li Başûr bûye sedema gelek pirsgirêkan û gelek zirerê daye Başûrê Kurdistanê û wiha got: "Lê, tevî vê yekê jî PDK vê ezmûnê li ser rojavayê Kurdistanê jî ferz dike û hewl dide li Rojava jî ev pergala dibe sedema pirsigrêkan pêk bîne. Divê ciwanên Rojavayê Kurdistanê yên li Başûr vegerin cihê xwe û li ser esasê qanûn û rêzikên Rojavayê Kurdistanê tevbigerin. Lê, ne li gorî berjewendî û daxwazên PDK'ê ku dixwaze li ser Rojava ferz bikin tevbigerin. Divê ciwan li gorî rastiya Rojava tevbigerin û nebin amûrekî ku PDK bixwaze sîstemeke dû rêveberî û du herêmî li Rojavayê Kurdistanê bi pêş bixe." **SILÊMANÎ - ROJNEWS**



## 'Biratiya olî' û girtina Enstîtûya Kurdî

Antîpatiya kurdên oldar û tirkên oldar a li hemberî kemalîstan ji destpêka avakirina Komara Tirkiyeyê heta niha didome. Gelek caran kurdên oldar û muhafazakar îdia kiriye ku pirsgirêkên kurdan dikarin di çarçoveya 'Biratiya Îslamê' de bên çareserkirin. Ango ji bo wan derdoran têkiliyên civakî û yekitiya neteweyî ne hêmayên girîng in.

Jixwe ji dema ku AKP li Tirkiyeyê bû desthilat heta niha kurdên oldar bi vê ferasetê her tim piştgirî da wê. Teoriya wan a esasî ev bû; 'Dema ku desthilatdariyeke oldar hat ser kar, wê demê kurd û tirk dikarin biratiya îmanê pêk bînin û pirsgirêkên xwe çareser bikin'. Ji ber vê hêviyê kurdên bawermend her tim piştgirî da AKP'ê. Bi gotineke din mirov dikare bibêje ew beşa kurdan bi van polîtikayên AKP'ê xapiyan.

Bêje
**Îskan Şîvhelan**

Lê AKP'ê û Erdogan çi qas desthilatdariya xwe qayîm û xurt kir, zilma xwe ya li hemberî kurdan jî ew qas dijwar kir. Bi taybetî piştî 15'ê Tîrmehê bi sedan sazî û dezgehên kurdan girtin. DÎAY-DER bi fermana Rewşa Awarte hat girtin. Li hemberî vê kirina AKP'ê mixabin oldarên kurd têra xwe bertek û nerazîbûn nîşan nedan. Hêjayê gotinê ye ku ji ber vê bêdengiya oldar û bawermendên kurd AKP tevî van kirinên xwe hîn ji derdikeve û dibêje; 'Ez nûnertiya kurdên bawermend dikim.'

*Çiller negirt, Erdogan girt*

Ji bo kirinên AKP'a ku bi maskeya îslamê dixwaze kurdan bixapîne, baş bên fêmkirin mînakeke balkêş heye. Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê ji hêla nemir Mûsa Anter, Feqî Huseyîn Sagniç û gelek rewşenbîrên kurd ve di sala 1992'yan de hat vekirin.

Wê demê peyva 'kurd' û 'kurdî' qedexe bû. Li Tirkiyeyê înkareke dijwar li ser nasnameya kurdî hebû. Lê dîsa jî dewleta wê deme Enstîtûya Kurdî negirt.

Ji vê mînakê mirov fêm dike ka dijminahiya AKP'a ku hinek kurdên bawermend ji bo xwe wek 'Destebiratiya Îslamê' dibînin di kîjan astê de ye. Erdogan û AKP'a qaşo misilman, li Sûriyeyê dijminahiya kurdên mazlûm ên piştî sed salan ji zilma rejîma Baasê rizgar bûne, dike.

Êdî maskeya AKP'ê ya misilmantiya sexte ku beşeke kurdan pê dixapand, ketiye xwarê. Teoriya 'biratiya îslamê' bi deste AKP'ê û Erdogan têk çûye. Jixwe di bin gotina 'biratiya îslamê' ya siyasetmedarên Tirkiyeyê de her tim faşîzm û nîjadperestiyeke hişk a tirkparêziyê hebûye.

Ji bilî hin komikên biçûk ên ji bo berjewendiya xwe ya dinyayî dev ji AKP'ê bernadin, hemû kurdên bawermend û misilman êdî ev rastî dîtiye. Ji teoriya Erdogan a 'biratiya misilmantiyê' faşîzm û neyartiya kurdan derketiye. Hevkariya AKP û MHP'ê nîşana wê yekê ye ku ya li ser kar ne polîtikaya misilmantiyê ye, polîtîkaya MHP'ê ya dijkurd e.

Tevî vê tabloya zelal tu kurdên bawermend û misilman ranabin û nabêjin; 'AKP misilman e û kurd jî misilman in. Lewre divê em piştgiriya wê bikin…' Êdî gelek av di bin pira wan derewan re herikiye. Tiştên ku kemalîstan di 30 salên dawîn de li kurdan nekirine, Erdogan û AKP'ê li wan kirin.

www.arsivakurdi.org

ROJEVA Medya
25 Çile 2017 Çarşem

# Careke din li Kobanê me...


ABDURRAHMAN GOK - DÎHABER

Dîrok 7'ê cotmeha 2014. Serokomar Recep Tayyip Erdogan li kampa penaberan a Dîlokê diaxive. Temeniya "Hêvîdar im ev cejna we ya dawîn ye ku hûn ê ji welatê xwe dûr pîroz bikin" bi penaberan re parve dike. Di berdewamiyê de jî wekî ku mizgîniya desteserkirina Kobanê ji hêla DAIŞ'ê ve bide dibêje "Kobanê jî hema ket ha ket." ew bi paş ve vekişiyan. Piştî 134 rojan, di 26'ê çileya 2015'an de êdî li şûna alên DAIŞ'ê yên li ser Girê Miştenûr û Kaniya Kurdan, alên YPG/YPJ'ê kesk û sor û zer diliviyan…

Sal 2017, meh Çile. Piştî 2 salan careke din ber bi Kobanê ve derdikevime rê. Lê vê carê ne bi rêyên qaçax. Ji Qamişlo di ser Amûdê, Serêkaniyê û Girê Spî re ku di wan rojên şerê giran de dikin. Dema bang li min dikin ez diricifim û heya êvarê li cihê xwe rûdinim. Ji bo gera bajêr xwe amade hîs nakim. Roja duyemîn careke din bi xwe nikarim. Roja sêyemîn bi gavên hûrik di kolanên cara yekemîn dibînim de, ber bi kolanên me şahidiya şerên giran lê kiribû ve dimeşim. Her gavek, min hinekî din nêzî wan rojan dike. Hestên min tevlihev dibin. Li aliyekî berxwedêrên ji bo çengeke ax, ji ciwaniya emrê xwe bûyî, li aliyê din kesên ji metreyeke axa xwe nebûyî!

Di wan rojên giran de ew zarok, astengdar û gelê sivîl ku digot "Em bi tu awayî xak, rûmet û zarokên xwe naterikînin", ew ciwanên li ser banga seferberiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, ji girtîgehan û leşkeriyê firar difikirim. Û wekî wan bi sedan berxwedêrên din…

Ji bo ku li cihê wekî muzexaneya servekirî hatiye veqetandin bigerim, vedigerime ber Peykera Jina Azad ku li her du milên wê tangên îmhakirî hene. Ji wir ber bi Qada Azadiyê ve ku peykereke baz li gel şopên guleyan hêj li piya ye dimeşim. Li kêleka peykerê baz, cihê dê Rifat Horoz (Karker Kobanê)



*Piştî 2 salan careke din ez diçime wî bajarê ku ji bilî şewqa guleyan tu ronahiyek lê tune bû. Xwediyên rastîn ên vî bajarî me pêşwazî dikin bi rûkeniya xwe ku her yek ji wan di bihara temenê xwe de bû wekî stêrkên biriqok*

Dema serokomar Erdogan ev axaftin dikir, ji Wan, Colemêrg, Agirî, Erzirom, Mûş, Bedlîs, Sêrt, Şirnex, Mêrdîn, Êlih, Amed, Riha, Semsûr, Mereş, Çewlig, Elezîz, Dêrsim, Dîlok, Edene, Îzmîr û Stenbolê bi hezaran kurd û dostên wan jî li bakûrê Kobanê li ser sînor di nobetê de bûn. Di xeta gundên Boydê, Xinêrk, Tilwerdan, Siwêdê, Edmanik, Mehser, Zehwan, Kazika, Merdsimêl, Musik, Qop, Xerebeşk, Elîzêr, Perepere û Oxan de; ji bo hêviya serdestan a ketina Kobanê pêk neyê bi inyad û bawerî zincîra berxwedanê ava kiribû.

Li gel ku her roj me ji nava Kobanê agahî digirtin jî, dîsa me geşedanên di çeperên berxwedanê de meraq dikirin. Heya 8'ê Cotmehê ku navenda nûçeyan ji bo ku ez geşedanên li Kobanê bişopînim biryara çûyîna min da. Bi hevalê xwe yê rojnameger Ersîn Çaksû re, di wan rojan de ku dihate gotin ku "Di Kobanê de sivîl qet nemane. 2 hezar endamên PYD'yê mane û ew jî bi DAIŞ'ê re şer dikin. Her du alî jî terorîst in" em derbasî Kobanê bûn. Di bin gulebarana leşkerên li sînor de, di nava herî û teqana di navbera darên fistiqan de, dema em ji sînor derbas dibin, me xwe di nava hemwelatiyên ku Kobanê terk nekiribû de û nêzî Girê Tilşeir dît.

Dema em ketin bajêr, DAIŞ ew qas motîve bûbû ku hindik mabû Deriyê Sînor ê Murşîtpinarê bi dest bixe. Wesayitên xwe yên bombebarkirî heya 500 metre nêzî deriyê sînor dianîn û diteqandin. Bi 13'ê Cotmehê re, êdî şervanên YPG/YPJ'yê derbe li ser derbeyê li DAIŞ'ê dan û gav bi gav, mal bi mal, kolan bi kolan wek navendeke îkmalê bû ji bo çeteyên DAIŞ'ê, xwe digihînim bajêr. Li noqteyên lêgerînê şervanên ereb, piştî ewraqên wesayitê kontrol dikin bi gotinên "Efû, ela re'sî wel eyn", li noqteyên şervanên kurd hene jî bi gotinên "Bibexşînin, ser seran û ser çavan" em rêwîtiya xwe didomînin.

Piştî Girê Spî li her gundekî Kobanê şopên berxwedêriyê hene. Dema em digihîjin gundê Serzorî, wêneyê 13 şervanên YPG/YPJ'yê yên di dema êrîşan de li ser bêtêlê xatir ji hevalan xwestibû û bi berxwedaneke mezin jiyana xwe ji dest dabû, me pêşwazî dikin. Di heman guzergahê de dema ji Bênder Xan, ber bi Bexdik ve diçim, Mizgîn Alan (Nefel) a ku bi rûkeniya xwe di mêjiyê min û yê bi milyonan mirovan de cih girtibû û bi 11 hevalên wê yên di 27'ê sibata 2015'yan de di dema rizgarkirina gundan de jiyana xwe ji dest dabû, bi bîr tînim. Piştre ji gundên Xirabnas, Eynbet, Teyri, Til Hacib, Şêran û Helincê, di binê quntara Miştenur re dikevime Kobanê.

Ew bajarê ku di rojên şerê giran de bi tirs, dem bi dem me xwe ditewand û dimeşiyan, di navbera kolanên wê de me bi zîqzaq baz dida û bêhna me diçikiya li pêşberî min e û vê carê bê tirs di kolanên wê de diçim. Li ser Cadeya 48'an ku di rojên şerê giran de min qet nedîtibû; lê tim min bi berxwedêriyê navê wê dibihîst, xwediyên rastîn ên vî bajarî me pêşwazî dikin. Bi rûkeniya li ser wêneyan, her yek ji wan ku di bihara temenê xwe de bûn, wekî stêrkekê dibiriqin.

Serê sibehê hevalên em bi hev re ji Qamişlo hatibûn, ji bo ku li bajêr bigerin amadekariyan

Dema ez digihîjim kolanên derdora Mizgefta Mezin, ku di wan rojên giran de her bihûsteke wê bi xwîn û xwêdanê hatibû avdan, kezeba min diperite… Xwezî dest nedana wan şopên lingên xerdik, wan dîwarên destên nazik û nazenîn li ser geriyabûn, wan kunên dîwaran ku di navbera malan de dibûn pirên siratê û xûzmeyên ronahiyê tê re derbas dibûn, nivîs û hêviyên li ser dîwaran, şopên gule û debabeyan, bêhna xwînê, têlên porên neşekirî, şûna xwêdan û rondikan, tasên avê, çaya di qedehan de nîvco mayî, cigareyên yek firt jê hatiye kişandin, nanê wekî kevir hişk, lûleyên heliyayî, du hevok hestiyariyên ji hezkiriyan re hatine nivîsandin…

Xwezî dest nedana wan dîwarên wekî seradê kunkunî, ku awirên çavan li ser geriyabûn, wan perdeyên sorgulî ku di navbera kolanan de hêviyên jiyanê diparastin, her 3 balonên kesk û sor û zer ku li kolana piştî Qada Aştiyê îşareta jiyanê bûn, wan kozikên ji brîketên riziyayî, ku şervanan li pişt jî xwe di ewlehiyê de hîs dikir, wan mankenên vîtrînan ku li koşeyên kolanan dijmin dixapandin. Dixwazim nas bikim wan kolanên ji şopên berxwedêriyê hatine paqijkirin! Gelo me bi Cûdî re li kîjan malê çay vexwaribû, me li kîjan malê ew kenê xweş ê Agirî li ser wêneyan neqş kiribû, me li kîjan mala tarî silav li Gelhat kiribû. Bi Bahoz, Metîn, Elî, Nûman, Feraşîn, Avareş û Şîn re li kîjan noqteyê hevpeyvîn kiribû.

Dema li derdora Mizgefta Mezin digerim, mîna kesekî cara yekemîn li van kolanan bigere, tev digerim. Şopên berxwedêriyê paqij kirine! Heyf. kiribûn, ew bav û dayikên zarokên xwe yên çend rojî li pey xwe hiştibûn, ew kesên ku bi salan li xurbetê xebitîbûn heya ji xwe re kargehek vekiribûn, ew kesên taximên xwe yên futbolê ku bi qasî amîgotiya wê dikir jê hez dikir li pey xwe hiştibûn, ew bavê ku li gel hevjîna wî jê re gotibû "ger tu biçî min û zarokan ji bîr bike" jî, xwe gihandibû hawara Kobanê têne bîra min. Kurê malê yê bi tenê ku digot "Min bihîst serê xwişk û birayên min di belayê de ye û ez hatim", ew kalên ku li gel guhên wan nedibihîst jî digot "teqez kareki ez jî bikim heye" li ber mala kesên jiyana xwe ji dest dida nobed digirt, ew bavê 6 zarokan ku radihişte çengek ax û digot "mirina me dê li ser vê axê be" û soza xwe pêk anî, ew her 2 xwişkên ku Kobanê neterikand, ji aliyekî ve xwarin amade dikirin, ji aliyekî ve birîndar derman dikirin, ew kal û pîr û welatiyên ji aliyekî ve şer dikirin, ji aliyekî ve jî hemû pêwîstiyên şervanan pêk dianîn, ew şervana bi rûkenî digot; "em ji bo xaka xwe, gelê xwe û rêberê xwe şer dikin. Em nekenin dê kê bikene", ew kalemêrê ku dema digot "li cem min pir ciwan şehîd ketin ji ber wê gotin di qirika min de dieliqin" û digiriya tên bîra min.

Ew şervana semsûrî ku dema dibihîst li bajarê wê bi deh hezaran welatî, ji bo Kobanê derketine kolanan rondik dibarandin, ew bavê ku piştî kurê wî derbasî Kobanê dibe, bi pey dikeve û dema berxwedêriya şervanan dît, bi kurê xwe re di kozikê de tev li berxwedanê bû, ew şervanê ku tiliyên wî tune bûn û ew li Kobanê dayika wî jî li sînorê Kobanê di nobedariyê de bû bikira "Muzexaneya Şehîdan" heye. Hêj jî xeyala Karker li benda pêkanînê ye. Di kolanan de dimeşim, zarok di nava kavilên şer de dileyizin. Li ber her kavilekî li ser tabelayeke spî navê berxwedêran heye. Hin esnafên bajêr jî wêneyên berxwedêran bi dikanên xwe ve daliqandine û dilsoziya xwe bi vî awayî didin der.

Li avahiya 4 qat ku Ebdusamed Bozan (Ferhad Kobanê) û Ezîz Miho (Dara Ebdî) jiyana xwe lê ji dest dabû hê jî kozikên şervanan, nivîsên wan ên li ser dîwaran û şopên guleyan hene. Li noqteya ku Rizgar Hesen (Rizgar Zagros) û Basil Dawid (Mezlûm Efrîn) lê ketine jî, topa obusê, wesayiteke zirxî ya îmhakirî û hewanên teqiyayî û neteqiyayî şahidiya wan êrîşên giran vedibêjin.

Li kêleka mizgefta ku hatibû rûxandin navê Vahap Guven (Îbrahîm Vahap) li ser tabelayekê ye û bala min dikişîne. Vahap ê ku bi seferberiyê hatibû Kobanê û piştî me pê re hevpeyvîn kiribû bi 3 rojan jiyana xwe ji dest dabû. Ew gotinên wî yên di wan rojan de têne bîra min. Wiha digot: "Ez li Deryaya Reş mezin bûme. Ji Trabzonê hatim. Ev berxwedêrî ne tenê berxwedêriya gelê kurd e, berxwedêriya wijdan e."

Ji wir ber bi avahiya Beyan Hemed (Destîna Qendîl) û 10 hevalên wê, di encama pevçûneke giran de jiyana xwe ji dest dabû ve dimeşim.

Ew Kobanêya ku li her kolaneke wê û bihûstek xaka wê xwîn rijiya, wekî "Bajarê Şehîdan" di nav rûpelên dîrokê de cihê xwe girt. Ew wêneyên li kolanan jî vê yekê nîşan didin.



## 'Em ji berxwedana jinên kurd hêzê digirin'

**WEQFA ÇAND Û HUNERÊ YA NEWROZÊ** li paytexeta Lubnanê li Beyrûtê şahiyek li dar xist. Di şahiyê de belgefîlma rojnamevana lubnanî Nebîle Xisyîn a li ser komkujiya Şengalê û jinên êzidî hat temaşekirin. Di belgefîlmê de, herî zêde berxwedana gerîlayên HPG û şervanên YBŞ'ê derket pêş. Derhêner û rojnamevan Xisyîn der barê çûna xwe ya Şengalê de hin agahî dan. Xisyîn diyar kir ku ew ji têkoşîn û berxwedna jinên kurd hêzê digire. Herî dawî seroka Weqfa Çand û Hunerê ya Newrozê Henan Osman axivî û ji derhêner û rojnameger Nebîle Xisyîn re spas kir û da zanîn ku pêkanîna aramiyê li Şengalê û mîsogeriya ewlekariya wê dê bi Rêveberiya Xweser a Şengalê pêk were. **BEYRÛT**

# Ji ber ku çand nasnameya jinan e êrîşan lê dikin





Piştî ku li Tirkiyeyê OHAL hate îlankirin, gelek sazî û dezgeh bi biryarnameyên di hikmê qanûnê hatin girtin û qeyûm tayînî gelek şaredariyên DBP'ê kirin. Navendên çand û hunere yên di banên şaredariyan de yan hatin girtin an jî xebatên wan hatin sekinandin.

Dengbêjên Wanê yên ku li dijî vê bêhiqûqiyê bê deng neman, bertek nîşanî êrîşên li ser çand û hunerê dan û diyar kir ku ew ê bi her awayî çanda kurdewarî bijînin.

***Dengbêjên Wanê bertek nîşanî êrîşên li ser sazî û dezgehên çand û hunerê dan û got ku ew ê tu carî destûrê nedin ku çanda kurdî winda bibe***

**NASNAMEYA JINAN E**

Dengbêj Meryem Tuncer da zanîn ku hikumet bi van êrîşan dixwaze çanda kurdewarî biqedîne û wiha axivî; "Hikumet bi van kirinan dixwaze hewldana me ya bi salan a ji bo parastina çanda kurdî têk bibe lê ev êrîş nikarin çanda me ya dewlemend ji holê rakin. Ji ber ku ev ziman, ev çanda qedîm a me ye. Lê dewlet ji çanda me, zimanê me û nasnameya me re rêzê nagire. Bi girtinan çanda kurd hedef digire. Êrîşên li ser çand û hunerê her roj zêde dibin. Çand nasnameya jinan e, jixwe ji ber wê ev qas êrîşên li ser çanda kurdî zêde bûne. Heya niha gelek saziyên me yên çand û hunerê hatin mohrkirin û girtin. Hikumet bi van êrîşan dixwaze gelê kurd bê huner û çand bihêle. Lê em dayik û jin bi salan e li hemberî vê hişmendiyê li ber xwe didin. Ji bo ku çanda me winda nebe me pir li ber xwe daye. Ji vê demê şûnde jî çi qas ji destê me were em ê li ber xwe bidin. Heya em jin li ser rûyê cîhanê bin em çanda xwe winda nakin û em destûr nadin van polîtîkayan. Heke pêdivî pê hebe em ê di dawetan de dengbêjiyê bikin an jî li malên gel em ê çanda xwe ya dengbêjiyê bidomînin."

**NIRXÊ HERÎ PÎROZ**

Dengbêj Mukaddes jî da xuyakirin ku dê tu carî ji sekna xwe tawîzê nedin û wiha got: "Ez di temenê xwe yê 12 salî de hatim zewicandin. Ez bi mirovekî 54 salî re zewicandim. Piştî ku ez zewicandim, min dest bi dengbêjiyê kir. Ji ber ku ez zarok bûm, min zehmetiyên herî mezin kişandin. Navê kilama min a ewil ku min di 12 saliya xwe de çêkir 'Ez bê dil şikestim' bû. Em bi salan e çanda xwe didomînin. Çi qas ji destê me bê em ê ji bo çanda xwe li ber xwe bidin. Ev êrîşên ser çanda me nikarin me bidin sekinandin. Dewlet bi salan e bi vî awayî tev digere. Ji ber ku dizanin gel û netew bi çand û hunera xwe dewlemend in. Lê em her tim hebûn, em ê her tim jî bi kilaman bi hunerê rastiyan derxin holê. Ji ber ku çand ji bo me dewlemdiya herî mezin û nirxê herî pîroz e." ***WAN***



## Li Tehranê hefteya fîlmên tirkî

Li paytexta Îranê Tehranê bi pêşengiya Enstîtuya Yunus Emre ya Tehranê (TYEE) û Mala Sînemavanên Îranê, Hefteya Fîlmên Tirkî yên Hemdem dest pê kir. Şahiya ku Balyozxaneya Tirkiyeyê ya Tehranê jî piştgiriyê didê, bi fîlmê 'Uzak Îhtîmal' a derhêner Mahmut Fazil Coşkun dest pê kir. Di şahiyê de dê 7 fîlmên tirkî derkevin pêşberî temaşevanan. Di çarçoveya şahiya ku dê heta 28'ê mehê berdewam bike de, dê fîlmê Bal (derhêner Semîh Kaplanoglu), Sêwas (derhêner Kaan Mujdecî), Bîr Zamanlar Anadolu'da, Kiş Uykusu (derhêner Nurî Bîlge Ceylan), Uç Yol (derhêner Faysal Soysal) û Kelebegîn Ruyası (derhêner Yilmaz Erdogan) bên temaşekirin. **TEHRAN**



## Loalwa Braz mirî hat dîtin

Stranbêja muzîka latînî Kaoma Loalwa Braz (63) ku bi strana Lambada deng vedaye, li Rio de Janerio di siwareya xwe de bi awayekî şewitî hat dîtin. Polîsan diyar kir ku wan siwareya şewitî li cem mala wê dîtiye û di maşînê de tûpa gazê hebûye. Koma Kaoma bi strana Lambada albûma wan bi qasî 30 milyon heb hatibû firotin. Solîsta komê Koalwa di sala 1985'an de piştî demeke dirêj li Fransayê ma, ji wir veqetiya û çû Brezilyayê. Loalwa li gelek deverên cîhanê konser dan, li Paradis Latin, Meridien û Madison Square Gardenê derket ser dikê. Loalwa li herêma Jacarepagua ya Rio de Janerioyê di sala 1953'yan de hatibû dinê, endamê Akademiya Hunerê ya Fransayê bû û xwediya nîşana zîv bû. **AMED**



## Ayrilik li Mala Şanoyê ye

Lîstika şanoyê ya bi navê 'Ayrilik' (Veqetîn) ji hêla koma şanoyê ya bi navê Mala Şanoyê ve derdikeve ser dikê. Lîstik ji aliyê qerfî ve gelekî bi îdia ye. Lîstika 'Ayrilik' ji hêla Behîç Ak ve hatiye nivîsandin û di lîstikê de şanogerên bi navên Sevinç Erbulak û Firat Taniş cih digirin. Dê promiyera Ayrilikê îro saet di 20.30'an de li Navenda Çandê ya Profiloyê pêk were. Mala Şanoyê di sala 2000'an de ji hêla Prof. Dr. Semîh Çelenk û Hamît Demîr ve hate avakirin û sala par Firat Taniş jî tev li xebatên vê komê bû û ev ekîb bi performanseke xurt û pêşketî xebatên xwe berdewam dikin. **STENBOL**

# Li HDP'ê kursên xwe didomînin

Komeleya Çand û Hunerê ya MED'ê li dijî pişaftina çand û hunerê di sala 2009'an de li navçeya Bagcilarê ya Stenbolê dest bi xebatên çandê kir. Piştî OHAL hat îlankirin bi biryarên KHK'ê ji aliyê Wezareta Karên Hundir ve tevî 370 komeleyan hat mohrkirin.

Piştî ku komele hat girtin, xebatkar û rêveberên navenda çandê dest bi lêgerîna qada perwerdehiyê kir. Komeleya MED'ê li avahiya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ya navçeya Gungorenê dest bi perwerdeya çandê kir. Komeleya MED'ê li HDP'ê perwerdeyê didin şagirtên xwe û wan perwerde dikin. Her çend kursiyer jî ji rewşê kêfxweş bin jî dixwazin dîsa cihê wan bê vekirin û li cihê xwe xebatên xwe berdewam bikin.

Endamê Koma Sterkên Azadiyê Muhsîn Sîpan ku di sala 2012'an de li Komeleya Çand û Hunerê ya MED'ê dest bi xebatê kir, diyar kir ku wî li komeleyê perwerdeya notayan dît û wiha got: "Pergalê xwest rê li pêş xebatên me bigire. Lê em dê li her derê xebatên xwe bimeşînin."

Sipan anî ziman ku piştî komele hat mohrkirin gel jî berteka mezin nîşan da û wiha axivî: "Gelê navçeya Gungorenê li çand û hunera xwe xwedî derdikeve. Divê ji niha û şûnde em bêtir li çand û hunera xwe xwedî derkevin. Em bang li xwendekarên navçeyê jî dikin ku tev li xebatên çandê bibin."

Şagirtê 12 salî Kenan Taş jî ew 3 sal bû li MED'ê kursa tembûrê didît. Taş diyar kir ku ji bo ku fêrî tembûrê bibe tê vir û ev tişt got: "Ez hinekî fêrî tembûrê bûm. Ji ber ku Komeleya Çand û Hunerê ya MED'ê hat girtin em tên li vir perwerdeyê dibînin. Em dixwazin dîsa komeleya me bê vekirin û em li wir perwerdehiya xwe berdewam bikin."

Taş got ku ew li vir hem kursa tembûrê dibîne û hem jî fêrî ziman dibe. ***STENBOL - DÎHABER***




## Ferhenga japonî û kurdî derxist

Lêkolînerê bi navê Vakkas Çolak ji Fakulteya Perwerdeyê ya Zanîngeha Dîcleyê derçûye. Çolak demeke dirêj li ser ferhenga japonî-kurdî xebitî û niha amade kiriye. Çolak çîrokên japonî jî wergerandine kurdî û kursa kurdî dide japonan. Çolak diyar kir ku armanca wî ew e ku di zanîngehê de kurdî wekî zimanê hilbijartî perwerdeya wê bê dayîn û li Japonyayê jî enstîtuyeke kurdî veke.

Çolak aşkera kir ku xebata wî ya bi navê 'Ferhenga Pirzimanî' niha li ber çapê ye û ev tişt got: "Ev xebat ji 246 rûpelan pêk tê û di ferhengê de 5 hezar peyv cih digirin. Ferheng bi 3 zaravayên kurdî yên kirmanckî, kurmancî û soranî hatiye amadekirin. Her wiha alfabeya japonî û li gel wê alfabeya latînî jî hatiye amadekirin, heke kurdên eleqeya wan bi zimanê japonî re hebe, dikarin hîn bibin." Çolak destnîşan kir ku xebata wî ya herî girîng jî 'Rêzimana Kurdî' ye û dê pirtûka wî di demeke nêz de derkeve.

**ÇÎROK JÎ WERGERANDIN**

Çolak piştrast kir ku wî berhemên japonî jî wergerî kurdî kirine û wiha pê de çû: "Min 4 çîrokên japonî wergerandin. Her wiha turîstên ku diçin Kurdistanê, min ji bo wan klavûza rojane jî amade kiriye. Lê derfetên me têrê nekirin, mixabin me çap nekir. Em wek Komeleya Çanda Kurdî hem çîrokên kurdî wergerî japonî dikin û hem jî yên japonî wergerî kurdî dikin, dê ev xebata me bidome.




Çolak herî dawî got ku armanca wan ew e ku ew li Japonyayê zimanê kurdî di zanîngehan de wek waneyên bijartî bidin xwendin û di hedefa wan de vekirina enstîtuyeke kurdî li Japonyayê jî heye. **TOKYO**

www.arsivakurd.org

# Îradeya xoserîye qezenç kerde



Z. NÊRGÎZ BOTAN / BAHOZ AMED / BEHDÎNAN – ANF

Dewleta tirk 24ê temuze 2015 de hetêk ra hêrişê Warê Pawitişê yê Medya kerde heto bîn ra zî hêrişê Xoserîya Demokratîke ke hetê şarî ra ameybî îlankerdiş, kerde. Sere de ciwanê kurdî yê YPSyî û heme şar vera herişanê îmhakerdişî de xover da. Hêrişê ke bi aşman dewam kerdî ver bi seyan kesê sîvîlî ameyî qetilkerdiş. Dewleta tirk her çiqas ke bi teknîkêko gird hêriş kerdêne zî vera îradeya şarê kurdî de zaîyatêko gird da.

Fermandarê YPSyî Şîyar Botanî serrgêra 1. ya awanbîyayîşê YPSyî de qisey kerd.

Fermandarê YPSyî Botanî va 'heqê her şarî est o ke xo bi xo îdare bikero û pawitişê xo bikero' û wina domna: "Dewleta tirk bi serran polîtîkayê zulm, zext û dagîrkerî ser şarê kurd de meşnaye. Êdî şarê ma waştêne ke nê hêrişan bivindarno û xo bi xo îdare bikero. Na çarçewa de xoserîya xo îlan kerd. Bi îlankerdişê xoserîya demokratîke hêrişê dewleta tirk zî dest pêkerd. Dewleta tirk sere de Gimgim, Sûr û Cizîr û sewbîna cayê ke xoserî tede ame îlankerdiş, hêrişê ê cayan kerde. Cizîr de 200 ra zêde kesî bi hawayo ganî veşnaye û wehşetêko gird meşna. Wehşeto ke ame kerdiş yê Hîtler û Mussolînî ra derbaz kerd. Dewleta tirk nê wehşetî çapemenî de sey serkewtişêko gird nîşan daye û waşte ke psîkolojîyê tersî bi heme şaran bida cuyayîş. Şaro ke Helebçe, Zîlan û Dêrsimî xo vîra nêkerdo, nê wehşetî zî xo vîra nêkeno."

*Fermandarê YPSyî Şîyar Botanî Serrgêra 1. ya awanbîyayîşê YPSyî pîroz kerd û derheqê xoverdayîşê Xoserîya Demokratîke de vînayîşê xo ard ziwan*

**BEBEKO 3 AŞMÎ QETIL KERDÎ**

Botanî qiseykerdişê xo de va 'xoverdayîşê YPS û şarê kurdî vera zêdebîyayîşê hêrişê dewleta tirk de her ke şî zêde bî' û wina va: "Xoverdayîş sifteyîn bi barîkat û xendekan dest pêkerd. Mi bi xo zî mîyanê xoverdayîşî de ca girewt. Ma nêwaştêne xoverdayîşo sîlehin dest pêbikero. Labelê vera nê hêrişan de ma mecbûr mendî. Kişta ma de bebeko 3 aşmî û merdimê extîyarî rasteyê ziqaqan de, beran ver de ameyî qetilkerdiş û dima ra xoverdayîş dest pêkerd."

**ŞARÊ ŞIRNEXÎ VA NÊ**

Botanî qiseykerdişê xo de bale ant xoverdayîşê Şirnexî ser û wina va: "Badê ke Haci Lokman Bîrlîk ame qetilkerdiş ra dima Şirnex de xoverdayîş dest pêkerd. Şarê Şirnexî heta nika qet koletî û teslîmbîyayîşî qebul nêkerdo. Dewleta tirk Cizîr û Sûr ra dima hêrişê Şirnexî zî kerde û Haci Lokman Bîrlîko ke welatperwerêk kurd bî qetil kerde û bi wesayît erdî ra kirantî. Ciwanê Şirnexî nêyî qebul nêkerdî û bi barîkat û xendekan waştî vera nê hêrişan de bivinderî. Ciwanan bi no hawa 82 rojan xover da û xoverdayîş vilayê heme bajaran bî. Çeteyê AKPyî tîya de zaîyatêko gird dayî.



**ARTÊŞA TIRK TERSÎ CUYAYE**


Botanî dîyar kerd ke artêşa tirk psîkolojîya tersî cuyaye û wina va: "Xoverdayîşê embazê Murat, Xwînda, Hîzan, Gever û Zeryan şarî ser de tesîrêko gird kerd. Bitaybetî xoverdayîşê embazê Muratî bi xo şînayêne hêrişanê dişmenî bivindarno. Dişmenî qet nêşîna meterîso ke embazê Murat tede bî, têk bişêro. Xoverdayîşê ci zaf zorî dayêne dişmenî û no heta şehadetê embazî dewam kerd. Her vîsta xoverdayîşî de qehremanîyêka girde ame cuyayîş."

**ŞARÊ MA SERE NÊRONENO**

Botanî peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Zaf cayanê Kurdistanî ra ciwanî ameyî beşdarê xoverdayîşê Şirnexî bîyî. Mîyanê nê xoverdayîşî de qehremanîyê girdî ameyî nîşandayîş. Ma do nê xoverdayîş û qehremanîyan xo vîra nêkerî. Ma do têkoşînê înan gird bikerî. Şarê ma zî nê qehremanan do xo vîra nêkero û rayîrê înan de bimeşo. Ez şexsê embazan de heme şehîdan bi hurmet yad kena û Serrgêra 1. ya awanbîyayîşê YPSyî pîroz kena."

## Artêşa tirke Nisêbîn de sendromêk cuyaye

**BOTANÎ dewamê qiseykerdişê xo de va 'Dewleta tirk Cizîr ra dima eynî hawa hêrişê bajaranê bînan zî kerde' û wina dewam kerd: "Bitaybetî Nisêbîn seba dewleta tirk bî sendromêk. Dewleta tirk bi tanq, top û heme teknîkê xo waşte bi dormegirewtişê şarê Sûrî, hemînan qir bikero. Sêvê, Fatma, Mehmet Tunç, Axîne, Pakîze, Çîyager û Çekoyî vera nê hêrişan de sere nêronayî û xoverdayîşêko gird nîşan dayî. Na qehremanîya înan her kesî rê bîye finak. Eynî hawa Nisêbîn de zî xoverdayîşêko gird ame nîşandayîş. Bi rayberîya embazê Xebatkarî de ruhêko fedaî vejîya orte. Her çiqas ke dewleta tirk bi îmkananê girdan hêriş kerde zî nêşînaye gamêk daxî bi ciwanan tepîya bida eştiş."**



Bena hol

## Referandûm, çira 'Ney'?



U. Serhildan Xonçikij

Derbe, OHAL, KHK… Tirkîya bi nê çîyan kewt 2017î. Teşebûsê derbeya 15ê temuze ra dima OHAL ame îlankerdiş, nameyê KHK ser o gelek qerarî ameyî girewtiş û hema zî eynî çîyî dewam kenî. Mîyanê nê dewamkerdişî de seba qederê Tirkîya çîyêko zaf muhîm rojeve de yo. Hikûmeto ke 2002î ra nata welat, bi kerden û vatişanê xo yê vera derbe de îdare kerdêne û qanûno bingeyîn o ke demê derbeyan de ameyî newekerdiş rexne kerdêne, nika teşebûsê derbeyêk ra dima derbe sey firsendêk dî û o zî dest bi newekerdişê qanûno bingeyîn kerd. Kurdî ronayîşê na komare ra heta nika xora mîyanê ti qanûnê bingeyînan de ca nêgirewtî û ti qanûnî bi kurdan nêameyî viraştiş. Werrekna wina nêbîyêne, werrekna no hikûmet peyê vatişanê xo de bivindertêne la nêbi, o zî sey bav û kalanê xo bi înkarkerdişê kurdan xo rê rayîrêk viraşt û nika o rayîr ser de şono.

Bi bedelnayîşê qanûno bingeyînî Tirkîya de demê dîktatorî dîyeno destpêkerdiş, na raştî hetê gelek dorûveran ra yeno zanayîş la semedo ke bingeyê nê erdan de nêvatişê raştîyan esto bê kurdan ti kes nêeşkeno na raştî biqêro. Weçînayîşê 7ê hezîrane ra ver xeberê sey sîstemê serektî vila bîyî û bitaybetî hetê Serekkomar Erdoganî ra propagandaya sîstemê serektî ameyêne kerdiş. Vera na propaganda de HDP ke kurdan û hetê demokratan esas girewtêne, hemleyêk da destpêkerdiş û sîstemo ke yeno waştiş rexne kerd. La ne o wext ne zî verê hedrekerdişê taslaqê qanûno bingeyîn de ti kes HDPî rê wayîr nêvejîya û semedo ke HDP vera na propaganda û înkarê kurdan de milê xo çewt nêkerd raştê lîncê hikûmetî û partîyanê bînan ame. Xora verê aye de Kurdistan de bi konseptêko newe şer dîyabi destpêkerdiş û qenalê sîyasetî ke HDP semedê vindarnayîşê şerî waştêne bişuxulna ameyê qefelnayîş. Nê qewimyayîşan ra dima demo ke nika bi OHALî yeno namekerdiş de meclîsê Tirkîya de pêvînayîşê qanûno bingeyîn ameyî kerdiş û teklîfê qanûnan ameyî qebûlkerdiş. Teklîfo ke bi raydayîşê parlementeranê AKP û MHPi ameyî qebûlkerdiş nika zî goreyê plananê hikûmetî wisarî de bi rayê referandûmî pêşkêşî şarî beno. Hikûmet û terefdarê ci semedê rayê 'Belê/E' dest bi propagandaya xo kerdî. CHP û tay kesê netewperest û laîstî zî dest bi propagandaya 'Ney' kerdî. CHP a ke ronayîşê komare de qanûno bingeyîno ke hêna bêkurdan amebi viraştiş de hikûmet bî û o zî heta nika bi sîyasetê înkarê kurdan ameye nika semedê pawitişê laîsîzmî vana 'Ney'. Çîyo bi nê qanûno bingeyînî yeno tena xurtkerdişê faşîzmî yo aye ra vatişê 'Ney' zî hêzêko pak û vera faşîzmî de têkoşînêko xurt nîşan dayo ra ancax eşkeno bireso hedefê xo. O hêz zî hêzê demokratîk ê Tirkîya ke mîyanê ci de kurdî, tirkî, erebî, laz û çerkezî cayê xo gênî dir eşkeno bibo vengêk. Ma cor de zî vatibî, bê kurdan qanûno bingeyîno ke yeno viraştiş hele hele qanûno bingeyîno ke demê OHALî de yeno viraştiş ne welatî rê ne zî şaranê nê welatî rê çîyêk nêano. Dewleta tirk tena sîstemê xo yê newe erzena felîyet û hikûmet û Serekkomaro ke peyê ci de goreyê înan se ra 50 rayê 'Belê/E' esto destê xo de çarnena. Yanî sîstemo ke yeno tena semedê Erdoganî ney semedê sibarojê faşîzma dewleta tirk yeno. Aye ra referandûm de vatişê 'Ney' heq o û gere no heq baş bêro şuxulnayîş. Maratonêko zaf zor verê ma de yo, semedê edelnayîşê faşîzmî nika ra qewet bo û serkewtiş…

# Ma do Kobanê bikerî bajarê cinîyan

**Endama Fermandarîya Pêroyî ya YPJyî Nesrîn Ebdullahe serrgêra 3. ya azadbîyayîşê Kobanê de qisey kerde û wina va: "Seba ke ma Kobanê bikerî bajarê cinîyan, çi destê ma ra bêro ma do bikerî û ma do rayberîya Sûrîyeyêka demokratîke bikerî"**



Bajaranê Rojawanî ra Kobanê 27ê çileyê 2012 de bi temamî ame azadkerdiş û Kantonê Kobanê ame îlankerdiş. Emser Serrgêra 3. ya awanbîyayîşê Kobanê yo.

Babete ser o Fermandarîya Pêroyî ya YPJyî ra Nesrîn Ebdullahe qisey kerde.

Nesrîn Ebdullahe dîyar kerde ke 'averşîyayîşê ke Kobanê de benî û serkewtişêko ameyo qezenckerdiş de keda bi hezaran merdiman esta' û wina va: "Her çiqas ke hende bedelê giranî ameyî dayîş, reyna zî vindetişo rûmetin ra tavîz nêame dayîş. Hem şar û hem zî şerwanî bi hawayo bêmabên wayîrê xeta azadî vejîyayî."

**YENO MANAYA MERGÎ**

Nesrîn Ebdullahe dewamê qiseykerdişê xo de va 'projeya xoserî yan zî neteweya demokratîke netîceyê keda ke ameye dayîş de vejîya orte' û wina dewam kerde: "Dejê girdî yê 2016î ra dima ma bi hêvîyanê girdan kewtî 2017. Şaran dejê girdî cuyayî û bedelanê giranan dayî. Ma yewna rey fam kerd ke eke ma biwazî problemanê şaran çareser bikerî, no ancax bi projeya neteweya demokratîke mumkin o. Na raştî Sûrîye û Îraq de ameye dîyayîş, zîhnîyetê netewe dewlete yeno manaya hîna zêde merg. Projeya federalîzmî projeya vindarnayîşê mergan o."

**YÊ HEME ŞARAN O**

Nesrîn Ebdullahe qiseykerdişê xo de va 'yê ke Kobanê de şehîd kewtî, çar parçeyê Kurdistanî ra ameybî' û wina domnaye: "Şehîd Gulane Êlih, şehîd Destîna Başûrê Kurdistanî, şehîd Arîne Rojawanê Kurdistanî û şehîd Jîyane zî Rojhelatê Kurdistanî ra kewtbî rayîr û ameybî Kobanê. Xoverdayîşê nê embazan seba yewîya neteweyî seba çar parçeyê Kurdistanî bî nimûne. Cinîyê ke Kobanê de xover dayî, bedenê xo kerdî sîper û vernîya çeteyanê DAIŞî de bîyî asteng."

**CINÎYAN KIRIŞT**

Nesrîn Ebdullahe peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Her çiqas ke serewedaritişê kurdan ameyî fetisnayîş, reyna zî şarê kurdî fek serewedaritişî ra veranêda. Kobanê bîye Kobanêya cinîyan. Çimkî yê ke azadî de israr kerdî û beyraqa xoverdayîşî kiriştî cinîyî bîy. Ma do bi heme hêzê xo seba ke Kobanê bikerî bajarê cinîyan têkoşînê xo gird bikerî û Sûrîyeyêka demokratîke rê rayberî bikerî. Ma do heta ke gêrayîşê heqîqetî ke saya Kobanê de yewna rey vejîya orte û tarîxê cinîyan ke hetê zîhnîyetê camêrdî ra ameyo verpaykerdiş, vejîyo orte, têkoşînê xo bidomnî." ***KOBANÊ - ŞÛJIN***

## "Eke çîyêk bêro sereyê lajê mi ez do gerre bikera"

NURÎ AKMAN / MUJDAT CAN / MELETÎ - DÎHABER

Astsubay Semîh Ozbey 17ê êlule 2015 de hetê HPGyîyan ra amebî berdiş û o wextî ra nata ti xebere Ozbeyî ra nîna girewtiş.

Pîyê Ozbeyî Serekê Heyetê Îdareyê Borsaya Tîcaretî yê Meletî Gursel Ozbeyî babete ser o qisey kerd.

Ozbeyî va '16 aşmî yo ma Semîh ra ti xebere nêgirewto' û wina domna: "Ma aye roje ra nata sey merde gêrenî û travmayêka gird cuyenî. Ez roja ke lajê mi hetê HPGyîyan ra ame berdiş ra nata tim seba ke operasyonî bivinderî, têkoşîn da. Heta seba ke operasyonî bivinderî ez bîya tirso ganî. Mi heta nika têkoşînê xo tim domnayo."

**BI AŞTÎ MUMKIN O**



Ozbeyî dewamê qiseykerdişê xo de va 'mi çend reyan Serekwezîr û Serekkomarî reyde pêvinayîş kerd û seba qedênayîşê şerî mi înan ra waşt ke wa reyna biagêrî prosesê çareserî' û wina va: "Labelê çi heyf ke her di hetî zî şerî domnayî û ma heta ewro ameyî. Tena waştişêk mi esto; wa leşker û polîsê ke amebî girewtiş, biresî keyeyanê xo. Rayîrê nêyî zî aştîye ra vîyareno."

**EZ DO GERRE BIKERA**

Ozbeyî peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Demê peynî de vanê 'ma do Qendîlî ser de operasyon bivirazî.' Mi Serekwezîr û Serekkomarî ra zî va, domanê ma ewja de yî. Eke çîyêk bêro sereyê domananê ma, ez do mehşer de şima ra gerrekar biba. Ma wazenî wa domanê ma bi hawayo sax teslîmê ma bêro kerdiş. Nika ra pey ez nêwazena ke lajê mi leşkerî bikero."

## Rayîrê Arîn Mîrkane de 2 wayî:

# Arîne û Mîrkane



JIYAN TEKOŞÎN / BEHDÎNAN - ANF


Arîn Mîrkana ke bi çalakîya xo ya fedaî azadîya Kobanê de bîbî sembole, eynî wextî de xeylê cinîyan rê bîbî fînak. Her hetî ra xeylê cinîyî Arîne Mîrkane xo rê fînak gênî û beşdarê têkoşînî benî. Arîne û Mîrkane ke wayê yewbînan î, nê cinîyan ra yî.

Arîne û Mîrkane eslê xo de Mêrdînî ra yî, labelê şert û mercan ver mecbûr mendî ke koçê Ewropa kerdî, beşdarê gerîla bîyî.

Gerîla Arîne û Mîrkane qala beşdarbîyayîş û hedefê xo kerdî.

**HEZARAN ARÎNÎ YENÎ**

Wayan ra Arîne va 'Arîne Mîrkane sere de cinîyanê kurdan û heme cinîyan rê rayîrê azadî nawite' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Ez zî na çalakîye ra dima beşdar bîya û mi ra dima waya mi beşdar bîye. Tena ez nê her kes dejê welat ra dûrî cuyayîşî zano. Labelê ma êdî nêwazenî welatê xo ra dûrî bicuyî, herinda ci de ma wazenî seba erdê xo şer bikerî. Arîn Mîrkane seba heme cinîyan bîye sembolêk. Ma zî sey aye bi hawayo bêters şerkerdişî esas gênî."



Wayan ra Mîrkana ke Arîne ra dima beşdarê gerîla bîya, va 'Mi xo bi xo va 'ganî no proses de ez zî hetê waya xo de biba' û qiseykerdişê xo wina daye domnayîş: "Cok ra ez beşdar bîya. Wa ti kes xo vîra nêkero; şehîdê ke sey Arîne seba nê welatî canê xo feda kerdî ra dima bi hezaran Arînî yenî."

**GANÎ MA BIAGÊRÎ**

Mîrkane peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Mîrkanê sey mi zî do înan ra dima têkoşînê xo bidomnî. Mîyanê nê têkoşînî de ca girewtiş, seba mi û keyeyê mi îftîxarêko gird o. Êdî wextê xerîbmendişî nîyo, ganî ma biagêrî cewherê xo û seba ci têkoşîn bidî."

## Şar nêeşkeno dermanan biherîno



Destpêka serra neweyî de zaf çîyan de vayî virazîya. Dezgehê Asayîşê Komelkî (SGK) zî muayene û dermanan rê mabenê sera 20 û 60î de vayî viraşt. SGKyî nêweşxaneyanê dewlete de sera 20, nêweşxaneyanê Cigêrayîş û Perwerdeyî de sera 40 û Unîversîteyan de zî sera 60 heqê muayene zêde kerd. Labelê tena muayene nê dermanan de zî vayî ame kerdiş.

Babete ser o Serekê Dezgehê Kontrolkerdişî yê Şaxa Edene Muzaffer Yuksel, dermankar Mesut Kuçukosmanoglu û Mehmet Alî Gulşenî qisey kerdî.

**ZÊDEBÎYAYÎŞ DO DEWAM BIKERO**

Yukselî dîyar kerd ke 'nêweşî nêeşkenî heqê dermanan bidî, zêdebîyayîşê heqê dermanan do nêweş û dermankaran bîyaro vera yewbînan' û dewam kerd: "Dermankarî tehsîldarîyê dewlete kenî. Her ke dovîz berz bibo do vayî dewam bikero."

Kuçukosmanogluyî qiseykerdişê xo de wina va: "Şar wexto ke seba herînayîşê dermanan yeno ewil vaya dermanan pers keno. Dima ra ewnîyeno ke derman wayî, veradanî û şonî. Vayî tewr zêde tesîrê xo da şarî ser."

**FATURA ŞARÎ RÊ BIRÎYENA**

Mehmet Alî Gulşenî bale ant zehmetîyê ke şar anceno ser û wina va: "Vayîya dermanan girêdayeyê dolar û euroyan a. 20ê sibate de do kurê Euroyî raştkerdişêk bêro kerdiş û no zî do bibo sebebê sera 9 û 10 zêdebîyayîşê dermanan. Netîceyê neyî do tunika welatîyan ra bivejîyo û welatî û dewlete rê bibo barêko giran. Faturaya krîzê ekonomî şarî rê yena birnayîş." **EDENE - DÎHABER**

## 'Ma nêzanî seba çi hepisxane de yo'



Rewşa OHALî de wextê tepîşte mendîşî derg bî. Dosyayê kesê ke tewfîq bîyî ser de zî qerarê nimiteyî yenî girewtiş. Bi hezaran merdimî ke tewfîqkerde yî, nêzanê seba çi yenê sucdar kerdene. Nînan ra yewe zî Ramazan Kurt o.

Ramazan Kurto ke qezaya Çinarî ya Amedî de cuyeno, teqayîşêko 23ê nîsana 2016 de rayîrê Mêrdîn û Amedî ser de bî ver, 26 nîsane de amebî tewqîfkerdiş.

Babete ser o cinîya Ramazanî Aynure û Av. Selameddîn Varolî qisey kerdî.

Aynure qala roja ke Ramazan ame tewfîqkerdiş kerde û wina va: "Hetê serê sibayî de eştî keyeyê ma ser de û Ramazan berdî. 9 aşmî yo ke ma paweyê azadîya Ramazanî yî. Ma nêzanê Ramazan seba çi ameyo tewfîqkerdiş. Ma hewte de tena 10 deqa yewbînan reyde qisey kenî. Hepisxaneyan de herîşî zêde bîyî. Ez do heqê mêrdeyê xo bigêra."

Avûkat Varolî zî wina va: "Seba ke dosyaya Ramazanî ser de qerarê nimiteyî est a, ma nêeşkenî agahîyan bigîrî. Texto ke teqayîş virazîyayo Ramazan Çinar de bî. Rewşa OHALî de dewlete wextê nezaretî derg kerde, cok ra çend aşmî yo ke doza Ramazanî nîno vînayîş. Ma do muracatê Mehkemeya Qanûno Bingeyî (AYM)." **AMED - ŞÛJIN**

ROJEVA
# Medya
25 Çile Çarşem 2017

**ROJEVA MEDYA**
**Ararat Basın - Yayın**
**Reklamcılık Adına**
İmtiyaz Sahibi:
**Murat SEKMEN**

Yazı İşleri Müdürü:
**Mehmet Çetin ALTUN**
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
***Yenişehir-DİYARBAKIR***

***Tel:*** 0 (412) 224 35 93
Baskı ***(ÇAP):***
***İstanbul:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. ***No:*** 23/A
***Küçükçekmece İSTANBUL***
***Tel:*** 0 (212) 580 63 81
***Adana:*** Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
***No:***13/A ***Yüreğir / ADANA***
***Tel:***0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
***e mail:***
rojevamedya@hotmail.com

## Bendava dagirkirina Eyn Dîwerê



**Dewleta tirk a ku bi awayekî dagirker nêzî axa Rojava dibe bi armanca guhertina berê ava çemê Dîcleyê ya ku diherike Rojava li gundê Eyn Dîwer ê Derîkê bendavek ava kir. Dewleta tirk a ku ji mijdara 2016'an û vir ve beşeke xaka gundê Eyn Dîwerê dagir kiriye û xendekan lê dikole, bi çêkirina bendavê dixwaze berê ava çemê Dicleyê biguherîne ser xaka Rojava, zeviyên çandiniyê û pira dîrokî ya Bafedê di bin avê de bihêle.**
**Ji ber vê helwesta dagirker û gemarî rayedarên tirk nahêlin şêniyên gundê Eyn Dîwerê nêzî bendavê bibin û hîn bibin ka li ser ava çemê Dîcleyê çi lîstik tên lîstin.**
**Gundiyên Eyn Dîwerê yên ku ji ber dagirkeriya dewleta tirk û avakirina bendavê nerazîbûnên xwe anîn ziman, aşkera kir ku bi vê yekê re zeviyên wan ên çandiniyê ku çavkaniya debara wan in dê di bin avê de bîminin.** *DÊRIK - ANHA*

# Çeteyan jiyan lê kir dojeh

## Dayika Zelxa ya 100 salî ku mala wê jî aliyê çeteyên Koalîsyona Niştîmanî ya Sûriyeyê ve hat rûxandin û mecbûrî dikanên rûxiyayî bû, jiyaneke gelekî biêş û keder derbas dike

Dayika Zelxa Îbrahîm Mihemed a 100 salî ku gelek êş û kedera çeteyên ku mala wê rûxandin kişand, niha di dikaneke rûxiyayî de bi tena serê xwe dijî.

Dayika Zelxa 40 sal in li taxa Hulok a rojhilatê Helebê dijî. Hevjînê dayika Zelxa beriya 10 salan çûye ser dilovaniya xwe. Bi destpêkirina Şoreşa Sûriyê re her şeş zarokên wê derketin derveyî welat û ew bi tenê hiştin.

Ji malbata dayika Zelxa tenê jinek li cem wê mabû û alîkariya wê dikir. Lê ew jî beriya 9 mehan di encama bombebarana rejîma Baasê de, jiyana xwe ji dest da. Dayika Zelxa ji heman bombebaranê filitî, lê ket nav pençên çeteyên Koalîsyona Niştîmanî ya Sûriyeyê. Dayika Zelxa gelek zilm û hovîtî ji destê çeteyan kişand.

Çeteyên ku dest danî ser mala dayika Zelxa, lê dan û ew avêtin kolanê. Piştî ku çeteyan mala dayika Zelxa desteser kir, di dikanên rûxiyayî de bi cih bû û jiyaneke biêş û keder derbas kir. Piştî ku taxa Hulok a rojhilatê Helebê hat rizgarkirin, dayika Zelxa vegeriya mala xwe. Lê ji ber ku çeteyan mala wê rûxandiye, dayika Zelxa careke din di dikaneke rûxiyayî de bi cih bû.



Dayika Zelxa ya ku di dikaneke rûxayî de bi tena serê xwe dijî, kaxizên pirtûkên kevn ji dibistanan berhev dike û hewl dide xwe li ber agirê van kaxizan ji sermaya zivistanê biparêze. Dayika Zelxa der barê jiyana xwe de axivî û êşa dilê xwe wiha anî ziman: "Derveyî Xwedê tu kesên min nîn in. Ez nizanim bi ku de biçim û bi çi rengî bijîm."

Dayika Zelxa zilma ku ji destê çeteyan kişandiye jî wiha vedibêje: "Çeteyan li min da. Ez avêtim erdê, ji ber ku min fermanên wan red kirin. Mala min kavil kirin û hemû tiştên min dizîn. Min gelek roj û şev bê nan û av derbas kirin. Zarokên min jî dev ji min berda û çûn." *HELEB - ANHA*

# Nebêjin tenê gir e!

DÎCLE MUFTUOĞGU / MÊRDÎN - DÎHABER


Li deşta Qosera Mêrdînê gelek gir hene. Yek ji van giran jî girê Heşeriyê ye. Li derdora gir gundek hatiye avakirin û bi demê re navê gund jî bûye Heşeriyê.

Girê Heşeriyê yê ku navê xwe li gund jî kiriye, girekî bilind û dîrokî ye. Ji ber bilindbûna gir, her tim gundî derdikevin ser gir û li derdorê temaşe dikin.

Li ser gir goristanek heye û goristan ji aliyê gundiyan ve bi baçikên kesk hatiye xemilandin. Gundiyên ku dem bi dem serdana goristanê dikin der barê çîroka gir de rîwayetên cuda tînin ziman. Li gorî agahiyên gundiyan gir di demên berê de bi armanca ku bi derdorê re têkilî bê dayîn, ji aliyê koleyan ve hatiye çêkirin.

Li gel ku ev gir, girekî dîrokî ye jî ji aliyê rayedarên dewletê ve heta niha kolandinên arkelojîk û lêgerîn nehatine kirin.

Lê belê gundiyan li gelek deverên gir kolandin kirine û rastî tunelan hatine. Li gund gotegotêna ku di gir de defîne hatine dîtin jî hene.



# Debara li ser sergoyan!



Li Amedê dîmenên ku herî zêde tên dîtin, dîmenên xizaniyê ne. Ev dîmenên xizaniyê xwe li gundên ku sergoyên bajêr lê tên valakirin baş dide xuyakirin.

Ev gundên ku sergoyên bajêr lê tên valakirin gundên herêma Qerejdaxê ne û xizanî xwe bi awayekî zelal li van gundan dide der. Zarokên malbatên xizan li ser van sergoyan di şert û mercên nebaş û bê tedbîr de dixebitin.

Sergoyên bajar ji gundiyên xizan ên Qerejdaxê re bûne deriyê debarê. Ji gundên derdorê nêzî 24 kes li navenda sergoyê dixebitin. Lê di nava wan de gelek zarok jî hene.

Zarokên temenê wan 13 û ciwanên 20-25 salî li ser sergo dixebitin û amûrên ku kêrî wan bên berhev dikin û difiroşin. Zarok û ciwan piştî dibistanê têne ser sergo û dest bi karê berhevkirina amûran dikin.

Ciwan û zarokên ku piranî karton û naylonan berhev dikin, ji bo tenduristiya xwe qet tedbîran nagirin û di şert û mercên nebaş û giran de dixebitin.

Ciwan û zarok kelûpelan li ser sergo ji hev cuda dikin û bi kîloyan difiroşin. Zarok û ciwanan anî ziman ku ew kîloya karton û naylonan tenê bi 650 qurûşan difiroşin. *SPUTNÎK*